

K.T

Zanîngeha Yüzüncü Yilê

Enstîtuya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî



BI ZARAVAYÊ SORANÎ HELBESTÊN ZAROKAN LÎ EDEBÊ KURDÎ DE

(Zêwer, Goran, Letîf Helmet û Emîn Mihemed)

TEZA LÎSANS A BİLİND

Zeyad Rashad Qader QADER

WAN – 2016

K.T

Zanîngeha Yüzüncü Yilê

Enstîtuya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî



BI ZARAVAYÊ SORANÎ HELBESTÊN ZAROKAN LÎ EDEBÊ KURDÎ DE

(Zêwer, Goran, Letîf Helmet û Emîn Mihemed)

TEZA LÎSANS A BİLİND

**Amadekar**

Zeyad Rashad Qader QADER

**Şêwirmend**

Alk. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

WAN-2016

T.C  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ EDEBİYATI VE KÜLTÜRÜ

**KÜRT EDEBİYATI SORANİ LEHÇESİNDE ÇOCUK ŞİİRLERİ**  
(ZÊWER, GORAN, LETÎF HELMET VE EMÎN MIHEMED)

YÜKSEK LİSANS TEZİ

**Hazırlayan**

Zeyad Rashad Qader QADER

**Tez Danışmanı**

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

**VAN – 2016**

## **Diyarî**

BomamosteyêhêjaAlk. Doç. Dr.Nesîm SÖNMEZ, bostêrênpaşeroja miletê kurd, bodiya minku heya niha li ba wê ez hêjaroki, bohevîna min, ku heya qediyavê xebatêtehemmula zaroktiya min kir û bozarokên şîrînên minPeyam, Kosar, Kavar, Padaşit û Akar.

## NAVEROK

KURTEBÊJE.....	IV
PÊŞGOTIN.....	V
1. DESTPÊK .....	1
1.1. Zarok û Qonaxên Jiyanê Zarokitî.....	1
1.1.1. Têrm û pênasê zarokî.....	1
1.1.2. Qonaxên Jiyanê Zarokan .....	1
1.1.2.1. Qonaxa Zarokîniyê Ji 3-5Salan: .....	2
1.1.2.2. Qonaxa Zarokîniyê Ji 6-8Salan: .....	2
1.1.2.3. Qonaxa Zarokîniyê Ji 9-12Salan: .....	2
1.1.2.4. Qonaxa Zarokîniyê Ji 13-18 Salan: .....	2
2. TÊGE Û TAYBETMENDÎ Û DÎROKA EDEBÊ ZAROKAN .....	3
2.1. Têgeha Edebê Zarokan .....	3
2.2. Qonaxa Ber Li Serhildana Edebê Zarokan .....	4
2.2.1. Pancatintira .....	5
2.2.2. Îzop (620)b.z.....	5
2.2.3. Kelîle û Dimine.....	6
2.2.4. Çîrokên Hizar û Êk Şev.....	7
2.2.5. Heqayetên Melayê Meşhûr.....	7
2.3. Peydabûna Edebê Zarokan Li Cîhanê De.....	7
2.4. Edebê Zarokan û Edebê Mezinan.....	9
2.5. Nivîskarê Zarokan û Zarokên Nivîskar .....	11
2.6. Taybetmendiya Edebê Zarokan.....	11
2.7. Hunerê Helbestê Zarokan .....	14
3. EDEBÊ ZAROKÊN KURD LI DESTPÊKÊ VE HEYA NIHA.....	15
3.1. Foliklora Kurdî û Edebê Zarokên Kurd.....	16
3.2. Rola Rojnamevaniya Kurdî Li Pêşxistina Edebê Zarokan De.....	17
3.3. Ezmûna Edîbên Zarokaniyê kurd.....	19
3.3.1. Qonaxa Yekem (1682 - 1920) .....	19
3.3.1.1. Ehmedê Xanî (1650-1706).....	19

3.3.1.2. Mela Xidirî Riwarî (1721-1781) .....	20
3.3.1.3. Şêx Marfî Nodê (1753- 1837) .....	20
3.3.1.4. Mewlewî (1806-1860) .....	20
3.3.2. Qonaxa Duyem (1920 - 1950).....	21
3.3.3. Qonaxa Sêyem (1950 - 1970).....	22
3.3.4. QonaxaÇarem (1970- 1991).....	22
3.3.5. Qonaxa Pêncem (1991- Heya Niha) .....	23
4. ÇAR HELBESTVAN .....	23
4.1. Zêwer (1875- 1948).....	23
4.1.1. Yekem: Jiyana Wî.....	23
4.1.2. Zêwer û Helbestên Zarokên Kurd.....	24
4.1.3. HelbestaPerwerde û Hînkari Li Berhemên Zêwer De.....	24
4.1.4. Zêwer û Sirûdê Dibistanan .....	31
4.1.5. Forma Helbestên Wî .....	33
4.2. Goran (1904-1962).....	35
4.2.1. Jiyana Wî.....	35
4.2.2. Goran û Helbest .....	35
4.2.3. Geşitek Bi NavHeşit Helbestê Goran De .....	36
4.2.4. Goran û Metelok .....	48
4.2.5. Sirûdên Goran.....	50
4.2.6. Çend Serincekê Giştî.....	53
4.3. Letîf Helmet .....	54
4.3.1. Jiyana Wî.....	54
4.3.2. Letîf Helmet û Nivîsîn û Wergeran Ji Bo Zarokan.....	55
4.3.3. Lîkolînên Li Ser Berhemên Helmet .....	56
4.3.4. Naveroka Helbestên Letîf Helmet .....	57
4.3.5. Formê Helbestên Letîf Helmet .....	67
4.4. Emîn Mihemed.....	74
4.4.1. Jiyana Wî.....	74
4.4.2. Berhemên Wî.....	74
4.4.3. Geşitek Bi Helbestên Emîn Mihemed De .....	75
4.4.4. Ziman û Formê Helbestên Emîn Mihemed .....	83

### III

ENCAM .....	93
PERAWÊZ .....	96
FERHENG .....	109
ÇAVKANÎ .....	113

**KURTEBÊJE**

a: amadekar

bin: binêre

b.z: berê zayn

ç :çap

r: rupel

z: zaynî (mîladî)

k: koçî (hicrî)

hud: her wekî dî

w: wergêr





## PÊŞGOTIN

Cîhana zarokan cîhanekê pakije, herwiha hûr û nazikejî, ew kesên ku digel cîhana zarokan daxifin û têkildarî dikin, lazime berî her tşitekî haydar yavê cîhana hûr û hestiyar hebin. Pişkekê mezin yavê têkilîdarî û peywendîjî digel zarokan li rêka edeb û tekestên edebê tên li darxistin.

Edebê zarokên kurd berawird bi dîroka edebê zarokan ya Ewropa û welatên rojavayî nûtir e, lê ne ewqasjî nû ye, lewma dîrokê edebê zarokên kurd bi awaiyekî hunerî dibe sed sal, digelvêçendêjî ew lêkolîn û dîrasetê heya niha li ser edebê zarokên kurd hatîne nivîsîn, berawird bi tekestên edebê ya niviskî ya zarokangelek kêmin, dibe ku ji bervê hokarê me axaftin ji edebê zarokan kir bi mijarêvê tezê. Evlêkolîn ji bilîpêşgotinek, li destpêkek û çar par pêk tê:

Destpêk ji boaxaftin derbarê têgeha zarok û şîrovekirina qonaxên 'emir û pêşgotina zarokan hatiye terxankirin.

Li beşekî naverokê vê tezê de, ku zêdetir di biwarê nezerîye û hatiye taybet kirin ji boaxaftin li têgeha edeb û edebê zarokan, herwiha bi kurtî behisêvêzimûnê hatiye kirin ku berî serhildana edebê zarokan hatîne encamdan, piştra serdeka dîrokî derbarêdestpêka serhildana edebê zarokan li cîhanê de hatiye behis kirin, piştra hevçûn û ji hevcudayî di navbera edebê zarokan û edebêgîştî hatiye gotin û herwiha merc û taybetmendiyên edebê zarokan û hunerên edebiyata zarokan hatiye şîrove kirin.

Herwiha di beşekî dî de ku taybete bi edebê zarokên kurd, têdapeywendiya edebêfoliklorî ya kurdî bi edebê zarokan û rola rojnamevaniya kurdî lipêşxistina edebê zarokên kurdî de hatiye behis kirin, herwiha qonaxêserhildan û geşekirina edebê zarokên kurd hatiye rave kirin.

Beşa dawiyê vê tezê hatiye terxankirin ji boaxaftin li helbest û ezimûnê mela 'EbidullayêZêwer, ku lipîştî salên bîstê li sedsala bîstem de, berhemêedebê zarokanî ya xwe bi zimanê kurdî û bi zaravayê soranî nivîsiye. Herwiha li helbesta zarokaniya helbestvan 'EbidullaGoran dixabite, herwihagengeşe li hemîvê metelok ûvê tekestên ku ji bo sirûdan ji aliyêGoran ve hatiye nivîsandin me şîrove kriye. Herwiha behisa helbest û ezimûnêLetîf Helmet hatiye kirin, ku li sala 1975 ûpiştira mîna helbestvanekî nûxaz û navdar hatiye nasîn û heya nihajî wî li berhem anîn û nivîsînê berdewame. Herwiha

liezimûna Emîn Mihemed, hatiye behis kirin, helbestvanê navbirê lipîşitê serhildana 1991 an de li başurê kurdistanê hate derketin û heya nihajî berdewam helbestan dînvîse.

Li dîmahîjê devê encamên ku li lêkolênê de ji bo me hatiye derketin ji çend xalek de hatiye nivîsîn. Piştra listê navênjêder ûçavkaniyan hatiye derxistin.

## 1. DESTPÊK

### 1.1. Zarok û Qonaxên Jiyanê Zarokî

#### 1.1.1. Têrm û pênaseya zarokî

Peyva zarok ku li kurdî de Mindal, Mindar, Minal, Cigergoşe, Cigersoz, Zaro, Zarû, Zarule, Bçîk, Pçûk, Role...jîjibotê bi kar anîn, li zimanê axaftina rojane û carina li zimanênivîsînî jî de Friznde û Frizen a farsî û Ewlad a 'erebîjî bowatayê zarok tê bi kar anîn.

Li Ferhenga Merdox de zarok yanî "Bêçûy miro".<sup>1</sup>Li ferhenga Xal jî de hatiye: "Zarok kesekejiy wî/wê negehişitibepazde salan".<sup>2</sup>Li ferhenga Kamêran de hatiye: "Zaro :miroêjiy wan ji sinîleyê û kêmtir".<sup>3</sup>Li însayklopîdiyaya azadî wîkpîdiyajî hatiye: "Zarok an beçkeyê mirobi miroê bçûk têtogin ku hêjne balix e".<sup>4</sup>Her li însayklopîdiyayê azadî wîkpîdiya hatiye: "Zarok bi awayêkêgelekgiştîjîdûnde ankotêşkê miroyan ra dhêtogin.Lê renga bi ramaneka dîjîher mirovekî ra kuhêjnegehişitibitjîy temenêgehişitinê ankobalixbûnê bihêtogin. zarodî zimanê kurdî de bi ramaneka dîjî dhêt bi kar anîn: Li beranberîpeyva daybaban. bivêramanê mirovên balix ûgehişitîjî her zaroyên daybabên xwe dmînin".<sup>5</sup>herwiha li Ferhenga Destî de hatiye nivîsîn: "Zarok: kur û keçên ku ji têkilîya zayendiya dû mirovan tèn dinyayê".<sup>6</sup>

Herwiha ligorî qanunîjîve wihapênaseya zarok hatiye kirin: "Her mirovekî/êjiyê wî/wê ji 18salan kêmtir bit, meger ligoreyê qanunê zelumînî berî hingî destpêbikt, zaroye".<sup>7</sup>Li benda yekem ya belavoka rêkxirawa zarokên ser bi neteweên êkgirtî YUNÎSÊFjî hatiye:"Zarok her mirovek kujîê hejde salan derbaz nekrbe, bi mercek berî hingî negehişitibite temena balix bûnêalruşd...".<sup>8</sup>

Di navkurdan de hatîtegotin ku Zarok meyweya malê ye, an dibêjin Malekî ku zarok têda be şeytan naçevê malê û Zarokgula navmalêye û Zarok fêqîya zivistanêye ûgelekgotin û bwêjên dî ku 'îbaret li mezinahî ûpîroziya zarok dikin.

#### 1.1.2. Qonaxên Jiyanê Zarokan

Berî em derbarê qonaxêjiyana zarokî bi awayekî zanistîgotubêjbikîn, her boxwe di navkurda de dabeşkirina navû têgeha zarok bo korpe, zarokê sava, parçele, heraş, mêrdzarok /mêrdmindal, newcewan û herezekar û hud... xuya dibe ku her êk li ast û

qonaxeka ji hevcuda daye, her êk ji wanjî taybetmendî û daxaz û xuzgeya xwe hene, wihajî asta fêh kirin û pêgehîşitina her qonaxekî bi curekê hevcudaye.

Ew qonaxbendî û polînîkarî /beş beş kirin ye jî ku ji bo jî û qonaxê ji hevcuda yê zarokjî hatiye diyar kirin, herçende hemû haydar û sporên biwarê derûnînasî û zarokînasî bipranî hev dengû hevira nîne, herwiha ew polînîkirin li dever û welatek û civakeke ji bodever û welatek û civakeka di têgohrîn, herwiha astêgeşe û pêgehîşitina keçan û kuranjî hinek dem ji hevcuda ne, digelwêçendê jî biawaiyekagelemperîpolên kirina qonaxên jî zarokan ji aliyê derûnînasî û lêkolînerê biwarê zarokan wiha tê dabêş kirin:

#### **1.1.2.1. Qonaxa Zarokîniyê Ji 3-5 Salan:**

Waqîyet û xiyal kirina sînûrdar, ku zarok livê qonaxê zêdetir peyweste bi daybab û endamên malbata xwe û di navçar diwarê malê de û tîştê derdorê xwenêzîke.

#### **1.1.2.2. Qonaxa Zarokîniyê Ji 6-8 Salan:**

Qonaxa xiyala berfreh, livê qonaxê de zarok li jîngeha xêzan û navmal diçe derve ji bo navcivak, tişt û buyarên zêdetir dibîne û bi xelikê dijî têkilîçê dike.

#### **1.1.2.3. Qonaxa Zarokîniyê Ji 9-12 Salan:**

Qonaxa li hingî û qehremanî, livê qonaxê de zarok zêdetir li waqî'a navcivakê nêzik dibe û canê pîris kirin û kar kirin û alîkarî kirinê li cem wî/wê çêdibe.

Livir de girînge bêgotin ku ji hinek qonaxan de edebê kuran û keçan heya astekî ji hevcuda dibin, lewma "hevcudaiyek di navbera kur û keçan de hene û herçend jî ew mezindibin ev hevcudayî zêdetir xûya dibe".<sup>9</sup> Bi taybetî di navbera 9-12 salan zarokên kur hêj li çîrokê palewanî û lehengî û can feda kirin û hud...dikin, li demekî de keçan zêdetir hez bi maldarî kirin û xemilandina malê û hud..dikin.

#### **1.1.2.4. Qonaxa Zarokîniyê Ji 13-18 Salan:**

Qonaxê mêmîndal/ mêmîzarokî ye, yan jî herzekar e, herwiha newcewan jî ji botê bi kar anîn, ku zarok livê qonaxê de erik û karê wî/wê berfrehtirdibe, gohrîn li hêlsukewt û laşê wî/wê tê ruwîdan.<sup>10</sup>

Digel ewe jî çunku asta rewşên bîriya civakî ligohartineka berdewam daye, bonimûne zarokê kurdî sed sal berî niha ku li komelgehekapaşketî û li navendeka kiştukalî û şvanîkartî de mezin bûbe digel zarokê wê serdemên niha de kugelek li hokarên xwe

rewşenbîrkin ji bowî/wê hatîne ferahem kirin hevcudayyekî zehif heye, bi kurtî "Ewçîrokê ku bozarokê 8 salan dibe, zarokê 3 salanjê fêma nake, bi berevajî hinek caran bonimûneoperêtek ji bozarokê 3 salançêjû zaniyarî lê werdigre lê zarokê 8 salan mîna bi henekan dizane".<sup>11</sup>

## 2. TÊGE Û TAYBETMENDÎ Û DÎROKA EDEBÊ ZAROKAN

### 2.1. Têgeha Edebê Zarokan

Berî ewey derbarê têgeha edebê zarokan biaxfin, hewcedarî dikepênaseyêke kurt ya têma edebê kirin.

Edeb: Peyva edeb di zimanê 'erebî de tê watayê rewîşt û m'amelat. Di biwarê têgehî û îstlahîjî tê watayê xweşikî û qeşengî û zerafet, di kurdî de ji bilî edeb, peyva Wêjêjî tê bi kar anîn, zêdetir jî peyva edebiyat tê bi kar anîn, kuprijmar yapeyva edebê ye, bi heman awayî di navtirik û farsan de edebiyat ku li peyva edeb y 'erebîve derbasî tirkî û farsî bûye tê bi kar anîn.<sup>12</sup> Bonimûne têtgotin: edebiyata kurdî û fakeltiya edebiyat û hud...herwiha mamoste Şakir Fettah dibêje: "Her nivîsînêk bi sedema rêzika darişitînêve dil û derûnê me bi livîne, anku hest bi rindî û xweşikî ya wî bê kirin, evwêje ye".<sup>13</sup>

Edebê zarokan: Ji botêgeha edebê zarokan di zimanê kurdî de edebê zarok, wêjeya mindalan, wêjeya zarokan, edebiyata zarokan, edebê mindalan. jî tê bi kar anîn, lê têma edebê mindalan bi taybet li zaravayê soranî de û edebê zarokan li zaravayê kurmancî de li têrmên di zêdetir tîn bi kar anîn.

Pênaseya Edebê Zarokan: Heya nihagelekpênaseya cur bi cur ji bo edebê zarokan hatîne kirin, li musu'e alhure wîkbîdiyay 'erebîjî de wihapênaseya edebê zarokan hatiye kirin: "Edeba zarokan cureyêke li huneredebê, kupêk tê li rêzîkê cur bi curên helbest û pexşanê taybete bi zarokan û ewên ku di xwarjîyê herizekarîyê dane".<sup>14</sup> Semîr Ebdulwehab dibêje: "Edebê zarokanvê hunere ye li rêgeya derbrîna soz û bi kar anîna ziman zarok bextewer dike".<sup>15</sup> Lipênasekê di ku ji bo edebê zarokan hatiye kirin: "Bi ew berhemên zîhnî ên ku ji bo zarokan têtgotin li hemû mijarên me'rîfe de".<sup>16</sup>

Wihajî hatîyepênase kirin: "Pêk tê ji komelekgotinê xweşik kuçêjû xweşî bi derûnê zarokan dide, êdî ewgotin bi helbest bin an bipexşan, anku bi zargotin be anjî bi xwendin û nivîsîn, bi stiran anjî bi sirûd ûgotar be".<sup>17</sup>

Hatiye gotin: "Mebest li edebê zarokanvê edebeye, bi helbest ûpexşan, ku ji alyêhelbestvan û edîban ténivîsîn ku li nêzîkve ezimûn û tecrubeya dewlemend hene, bi sedema karêperwerdeyî karîne bi naxê zarokande bçine xar û ew dizanin hewcedarî ya hestî û nestiya zarokan li ku daye û çî tişit ji bozarokan ténivîsîn ".<sup>18</sup>Herwiha hatîtegotin: "Mebest li edebê zarokan ewe her mijarekî nivîsandî ku bi wan bêpêşkêş kirin, mînapirtûk û kovar û rojname bi formêçîrok anku helbest an şanogerî an her mijareka dî ya edebê an zanistî".<sup>19</sup>

Edebê zarokan boxwepeywendî ûgotubêje digel zarokan, rêkeke ji bonêzik ketin ji zarokan û fêm kirin ji wan, bêguman evli hev fêm kirin û wpeywendî ûgotubêjêjî dixaze ku merivli can û hest û hêvî ya zarokan nêzîk be, mîna Hom Cînot dibêje: "Jibogehişitin bi canê zarokan û kêr kirina nakukî digel wan de, pêdvî bi rewşiteka nû yapêwendî ûgotubêjan hene".<sup>20</sup>Gotubêj kirinêjî ji boxwe ne tenê hunere, lê belê "Hunerekaê gelek taybet e û bingeh û yasayê taybet bi xwe hene, gotina zarokan xwerû û hêsanin".<sup>21</sup>

Gelekpênaseya dî jî ji botêgehaedebê zarokan hatîye kirin, lewra li navpênasan de em dikarîn bêjîn: Edebê zarokan berhem û mijar û tekestên edebê ne, ku digel zarok diaxfîn û ji bozarokan tén nivîsîn û derbrîn /te'bîr li xewn û xuliya û cîhanê zarokan dîkin, îca ew berhem û mijar çî helbest bin anpexşan, herwiha bi zimanek bêgotin ku di asta şîyan û fêm kirin û xiyala zarokan de be û ser bi ferhenga zarokan be.

## 2.2. Qonaxa Ber Li Serhildana Edebê Zarokan

Weke tê dîtin beşeka zehif diçîrokê millîû heqayetêfoliklorîgelek caran bi xwe biçîrok û tekestêmezînan tén hesbandin, digelvêçendêjî hinek hêman û wêne û buyerê navvê tekestan li şîyan û hest û sirşîtê zarokî nêzîkin. Hege behisa dîroka berîpeydabûna edebê zarokan bikîn bi awaiyekî hunerî û zanistî lazime bêjîn edebê zarokan ne wek naverok lê belê weke têrm di berê de tu navû nasiname ûpênaseyeka diyarîkrî ji bonehatiye kirin, lewma dibe weke naverokvegerîn ji bodestpêkapeydabûna edeba navbrî wek naverok bi qasî ku tê zanîn li lorîka daykanve destpêdike, ku hemgelek caran ewey ji aliyê dayk dihatgotin bi kêş û qafiye bûye, hemjî bi awaz dihatgotin, ku "Lorîk tenê derdêdilê daykan nîne, lê belê dayk hemû hêvî û xozîyaxwe lipaşeroja zarokêxwe de dibîne".<sup>22</sup>Herwihadibe kuçîrokê ber agrdan û tekest û listikêfoliklorîjî hemû ew serburdên bi hebû nebû/ hebû tu nebû,<sup>23</sup> destpêdikin bi qonaxa berî serhildana edebê zarokan bê navzed kirin. Piştirabehis li heqayetên Bancatintira ûçîrokên Îzopû heqayetên hezar û êk şeve û kelîle û dîmineya

Beydebay... tê.Îcaçunku di berê de tu edebek nebû bi navê edebê zarokan, lê belêtêkil bûye, lê beşek li kelepûra edebê dunyayê bi şêwazek hatiye nivîsîn ku digelmezinan, zarokjî fêm dikin, mînaçewa beşêmezinanî têda, bi endazek - hindik an gelek - beşê zarokanjî têdaye, lewra livir de mebest destpêka derketina edebê zarokan nîne bi ew wata ûpênaseyê hunerî ku îro ji boedebê navbirî tê kirin, lê belê mebest ew tekest û berhemên edebê ye ku li dema xwede taybet ji bozarokan nehatîne nivîsîn û kinca edebê zarokanjî lê nehatiye kirin, lê form û navaxinê ew berhem û tekestên cur bi cur bi xwe heya asteka berçav ji bozarokan tênguncan, ew lê fêm diken û bandora li ser wan hene, bi wateyeka dî ew berhemên ku bi foliklora zarokan tînan nasîn, ku "Bi tevî berhemê netewek ku taybet bi zarokan ûpiştawpişt û bi demkî hatiyeparastin".<sup>24</sup>Ew berhemên kevinarjî ku dikevin berî serhildana edebê zarokan bi watayê zanistî û hunerî, pêwîste em balêxwe bikşîninçend nimûneka cîhanî ya ku berî serhildana edebê zarokan hatîne nivîsîn û bandor li ser edebê zarokan ya dunyayê kirine.

### 2.2.1. Pancatintira

Heqayeta Pancatintira ku liçendgotin û biserhat /serboriekî kevinê hindîpêk tê û bi gencîneyapênc bend jî tê nas kirin, biserhatên Bancatintirajî aliyê berahîmekî hindî hatiye danan û li ser zimanêcandaran qala riwîdanan tê kirin.Beşek ji vê berhemê bi rêzikapexşan hatiye nivîsîn, beşa Duyemjî kupend û hîkmetin bi şêwaza nezim hatîne nivîsîn, têtogtingencîneyapênc bend li derdorê sala 500-100 b.z bi zimanê saniskrîtî hatiye danan, di berê de hatiye wergerandin ji bozimanêpehlewî, piştira ji bogelek li zimanên cîhanê hatiye terceme kirin.<sup>25</sup>

### 2.2.2. Îzop (620)b.z

Îzop an Îsop /Aesop "Derbarê wî hindik tşit tînan zanîn. têtogin ku Îzopberîy zaynê di navbera salên (620- 560) yi de jiyaye".<sup>26</sup>Çîrokên Îzopku bi berhemê herî kevinê ewrupa tînan hesbandin û bipranî li ser candaran hatînegotin, çîrokên wî ne taybet bûn bi zarokan, lê bi sedemavêçendê ku bi zimaneke xwerû û kurt hatîne nivîsîn ûpranîya karakterênçîrokên jîcandarin, lewragelek ji bozarokan li hevîn û li qal kirina dîroka edebê zarokên cîhanê de tu dem naên ji bîr kirin, ji bervêçendêjî ji aliyê Meksîmos Biladmosvepiştîpeydabûna çapemeniyan li sala 1475 an deçîrokên Îzopî hatîneçapkirin, piştî ewe ji boçend zimanê cîhanê hatin wergerandin, li navkurdanjî de ji aliyê 'EzîzGerdî hatiye wergerandin ji boser zimanê kurdî bi soranî û li sala 1982 an de hatiyeçapkirin, herwiha ji aliyê SidîqGorîcan hatiye wergerandin ji boser zimanê kurdî bi kurmançî û li sala 2013 an de hatiyeçapkirin.

Bonimûne li êk liçîrokên Îzopde bi navêRuvî û Legleg de hatîye:Rovî û leglegê hevnas kirine û bûne dostên hev.rojekê, rovî, leglegêgazî şîvêdike ûjê ra tenê şorbekîçêdike. şorbeyî dixataseka qam û tenik û datîne ber leglegê, leglegî bi hêsanî nikare wê şorbeyê fr bikeserêxwe bi nikulêxwe bixwe. hew serê nikulê wê şl dibe ew qas! şorbeyê di taskê de dhêle û ji ser sfrê brçî radibe. rovî li mîvana xwe dinêre: "bibexşîne ezbenî! bawerim, şorbe ne be dilê te bû, ne wisa?" dibêje.legleg: "na, hewceyê 'efuxastinê nake" dibêje.

Piştî qasekê, radibe xatir dxwaze, ji mala rovî derdikeve û diçe. di rê de dfkre ku dvê ewjî, rojekê rovya dostêxwegazî şîvê bike, wî çî aniyê serê wê, ewjî bîne serê wî û wekî wî bike.

Rojtê, leglegî ji boşîvê rovîy hevalêxwegazî mala xwedike ûjê ra xwarinekîçêdike. lê ewjî xwarinêdixataseka fraxekapr ziravû devteng.fraxeke sa ye ku rovî nikarepozêxwejî drêjî navîçbike. tenê devk û derveyê fraxê dalêse û brçî dmîne.

Legleg, piştîvê halê rovî, wihadibêje: "ez bi xwe ji boşîvê lêburînê naxwazim.jxwe ne hewce yêjî". îcar, mirov çî bike, tekez dê werêpêşiya mirovrojekê.<sup>27</sup>

### 2.2.3. Kelîle û Dimine

Kelîle û Diminejî ku ji alyê feylesûfê hindî Beydebayve hatiye nivîsandin, ji komelekçîrokên bi wata ûgotinên bi rumet têpêk hatin ûpraniya wanjî li ser zimanê candaran hatînegotin.Herçîrokek di komelek ruwîdan û buyer têpêk hatin li cihêxwe de ji bozarokan nehatîne nivîsîn, ewejî xûyaye ku ji bozarokgrane ûgelek car lihingû buyerê serekî yaçîrokê ji bîr diçin, lê biparçeparçe ûçîrok biçîrok qal kirin û behiskirin ji bozarokançêjû bandora xwe heye, lewragelek liçîrokên navKelîle û Dîmine bi helbest ûçîrok û sînariyocareka dî ji bozarokan hatîne darşitin û tekestêxweşik û teji wata lê hatîneçê kirin, beşek li helbestvanê kurdan jî bi taybet di navbera salên (1920-1975)an de hinek liçîrokên navhatî mînaçîrokehelbest ji bozarokan krîne kurdî û tekestê serketî û nazikî jê hatîyeçê kirin, li êk ji çîrokên Beydebay de dibêje: Dûçeşel /turig hebûn ku navê wan KelîleûDîmine bû, xudanê zanîn û huner bûn. Dîmine bi Kelile ya brayêxwegot:Ji berçî evşêr li cihêxwe nalive?! Kelilegot tu karê tu bivêgotinê heye? me niha li deryêpaşa dane çî tşit ew bixaze me ew dikîn, her tşitekji ew nexwaze me ew livê tşitê dîr dikevîn, me li astê wî de nîne hitagotin derbarêgotina wî bêjîn. ewejî bzane her kesekî xwe di karêxelikî tîkil bike ew dem karesat tê serê wî ku hatin serê meymûnî de, Dîminegot:



Ewçewa bû? çi hat serê meymûnî? Kelîlegot:.....".<sup>28</sup> Êdî diçe navbûyereka dî, piştira riûdawên dî tîn.

#### 2.2.4. Çîrokên Hizar û Êk Şev

Herwihaçîrokên Hizar û êk şev jî herçnde li hinek cih de hem bûyer û karakter, hemjîpeyvûgotin ser bi cîhan û ferhenga zarokan nîne, lêgelek biserhat/serborî ûçîrokjî têda hene ku bi sana kirin û kurt kirin bi temamî ji alyê zarokan tîn fêm kirin." Çîrokên hizar û êk şev li destpêka sedisala hejdan de boser zimanê ewrupayî hatîne wergerandin. Niha jî mîna dibêjinrojhilat bi welatêhizar û êk şev tê nasîn".<sup>29</sup>

#### 2.2.5. Heqayetên Melayê Meşhûr

Herwiha heqayetên Melayê Meşhûr ku li cem 'ereban bi Cuha an CuhayêRomî, li ba tirik û azerbaycaniyan bi Mela Nesiredîn an Xwace Nesiredîn yan Nesiredîn Efendî û li ba farsanjî bi Melayê Mezbûre berinyase, li cemgelê wêgurjî ku li welatê çîn dijîn dibeEfantî ku bi watayêEfendî tê, li navkurdanjî bi Melayê Meşhûr û Melayê Mezbûrejî navdare.<sup>30</sup> Bi sedema xwerû û kurtiya biserhatan ûgelek carjî hebûna riûdawê komedî, heqayetên navbirî bûye tiştêkî xoşitvî û bi navû deng ji cem zarokan, ji ber hindê beşek li heqayetên Melayê Meşhûr weke senariyoûçîrokê bi wêne li kovar û rojnameyên zarokan hatîne belavkirin.

Melayê Meşhûr samaneke bilind û dewlemenda edebêye ûpraniya neteweyên rojhilatjî bi edeb û berhemêxwe dzanin, bi her renekî be heqayetê wî ser bi edebêgalte û komîdîne, ku têda rexine li rewşa komelayetî û siyasîjî digre, digel ewejîçende ji bomezinan balkêşe, ji bozarokanjî zêdetir mêze diken. Mînakek li heqayetên Melayê Meşhûr":Komelek mirodiçin cem melayê û dibêjin em dixazîn li ser mînberê ji gotarêxwe de nesîhetê me bikî, melajî diçe ser mînberê û dibêje: Hun sipas û stayşêXudayêdilovan bikin, ewjî dibêjinji berçî?Mela dibêje: Lazime hemûgavbêjin şukir ji Xwedê ra, çunku hege canewreka mîna hwîştir xudan bal ba, hwîştir bi bal firî ba ezimanê û çûba ser xaniyan û xaniyê wejî bi ser ser û milê we de diherifi".<sup>31</sup>

### 2.3. Peydabûna Edebê Zarokan Li Cîhanê De

Hita niha bi temamî nehatiye zanîn ji bodesinîşan kirina dîrokeke bi rê û cêh derbarê derketin û serhildana yekem berhema edebê ya zarokan, lewma li destpêk de hinekbiserhatê navcivakî hebûye, piştira hatiye kom kirin û nivîsandin, li berahîjî de edebêmezinan û zarokan bi hevra bûne û nehatîne ji hevcuda kirin, "Hiya îropênaseke têt û

temamî wiha nîne ku bikare hemû beşên edebê zarokan kom bike û têkil bi edebêmezinan nebe".<sup>32</sup>

Digel ewejî her dibe lew cêh behis bê kirin ku edebê zarokan mîna têrmpayda bûye û edebê zarokan ji ya mezinan hatîte ji hevcuda kirin, lewra hege qonaxa yekem yapeydabûn ûpêşketina edebê zarokan li welatên Ewropa mîna Firensa,Îngltera,Danimark,Elmaniya û Rusiya behis bikîn.

Bi qasî ku tê zanîn destpêka edebê zarokan li hikayetên Can Dî Lavontîn 1623- 1695 ve destpêdike, hinekjî dibêjin yekempirtûk Mamalwîza=Diya Qazê Min bûye, ku li sala 1697an de li Firensayê hatiyeçapkirin.Her heman komeleçîrok li sala 1729an de boser zimanê inglîzî hatîte wergerandin.Herwiha herdû sedisala 18 û 19an biçerxê zêrînê edebê zarokan tê bi navkirin.Pirtûka Mamalwîza ji aliyê helbestvanêFirensayîÇarlzPîro 1628-1703li sala 1697 an de hatiye nivîsîn, ku li komeleçîrokêkpêk tê ji bomezin û zarokan, lêpiştira buye destpêkek ji bonivîsîna yê dî û tekestêedebê ya taybet bi zarokan.<sup>33</sup>Navborî komelekçîrokî kom kir û berhevkir, çavkanîy bîran deşit û der ûgundê welatêFeirenisa bûn, mînaçîroka Sendrêla û hinekçîrokên dî ku ji bilî belavbûna ewan di ser kaxezê, herwiha mîna filmê kartonîjî hatîne belavkirin.

Li inglteraçîroka Robinisin Kiroz ya Daniyal Dîfo (1731 -1660) ku li sala 1719 an de hatiye belavkirin ûgeşitên Celîfer ya Conasan Swift di navedebê zarokan de cihê wan herî berçave û bi destpêka edebê zarokan ya inglîzî tèn bi navkirin.

Di elmaniyajî YagubGrîm û WilyemGirîm berinyas bi BrayênGrîm ku li malbateka elmaniya bûne, li sala 1812 an de, pirtûkeke zarokanî ji cem wan hatiye nivîsîn, piştirapirtûka Duyemjî nivîsandine, çîrokên navherdûpirtûkên BrayênGrîm li komelekçîrokên xeyalî û efsaneyî tênpêk hatin ku li ser zimanêxelikdihatingotin, bandoraçîrokên Yagub û Wilyem li ser edebê zarokan li ewropa û hemû cîhanê berçave û berhemên wan bogelek ji zimanê cîhanê hatîne wergerandin.

Li danîmarkjî nivîskarê navdar Hanz Kirstiyan Endersin (1805-1875) komelekçîrok ji bozarokan nivîsandiye û li seraniserê cîhanê hatiye nasîn, ji bervêçendê xelatekî cîhanî ya navdar bi navê Endersin tê bexşîn ji bonivîskarê herî serketî yêbiwarê zarokan.

Li rusiyajîElîksanderPuşkîn ûjimareka nivîskarên dî, mîna Tolstoî, Çîxef, MaksîmGorkî roleka mezin dîtine ji serhildan ûpêşxistina destpêka edebê zarokan ya rusiyayê.

Piştî cengê yekem ya cîhanî qonaxeke nû li edebê zarokan li ewropa destpêdikit, lewma livê demêde edebê zarokan bi awaiyekegelek berfretir ûçalaktirpêş ket û berhemekagelek zor divê warî de hatin belavkirin ûçapkirin.

li edeba êranîjî cihê destê her êk ji Fezlulla Subhî, Sadq Hidayet û 'Ebibehis Şerîf liçeşe kirin ûpêş xistina edebê zarokan berçavdikeve.

Li cîhanê 'erebîjî de têrma edebê zarokan li sala 1930 an de bi kar hatiye.<sup>34</sup> Lêpêşîvê dîrokêjî destpêka serhildana edebê zarokan li welatêMîsir hatîte serhildan li dîmahiya sedisala 19an de, bi taybet li demekî de ku ji alyêRefa'e Tehitawî (1801 - 1873), ku li sala 1870 an depirtûkek bi navê almirşd alamîn lilbinat walbenîn ku bi destpêkapeydabûna edebê zarokan li mîsir û cîhanê 'erebî tê danan.Piştira her li mîsirêçîrokê zarokan di navprograma xwendinêvê welatê hatîte danan, piştî ewe her li mîsirjimarekçîrokvan û helbestvanê dî dest kirine bi nivîsîn ji bozarokan û yê herî diyar mîna: Ehmed Şewqî 1868-1933ê helbestvan bû.<sup>35</sup> Kujimareka zehif helbest û sirûd ûçîrokehelbest nivîsandiye û beşek ji wanjî hatîne wergerandin ji bozer zimanê kurdî.Piştî ewjîçend navekê dî hatin derketin, mîna KamilGeylanî1897-1959. herçnde D.Necîb Algîlanî li behisa serhildana edebê zarokan ya 'erebî wiha xuya dike ku bi cureka zelal heya destpêka sedisala 20an evcureyê edebê di nav' ereban de nehatîye serhildan.<sup>36</sup> Sebaret bi edebê zarokan li welatê 'êraqî bi qasî ku têtogin li dumahiya salên 60 an ya sedisala burî de helbestê zarokanpêş ket, bi taybet ku herdû kovara Micellî û Almizmar hatin derketin, herwiha navbera sala 1975-1979 an bi dema zêrîn ya helbestê zarokan li 'êraqê tê bi navkirin.<sup>37</sup>

#### **2.4. Edebê Zarokan û Edebê Mezinan**

Edebê zarokan beşekegirîngû mezin ya edebêpêk tîne û bêgumangelek nivîskarêmezînan û navdar hen ku serketina mezin bi dest anîne li biwarênivîsînêmezînan de, lê hervênivîskarêmezînan dibe ku beşeke kêr ji wan karî bin ji bozarokan binvîsin û serketî bin, lewma hîlbjartina evpeyvû hevukê ser bi ferhenga zarokan û axaftin digel cîhan û sirşit û saykolojya û taybetmendî ê zarokan, hunerekê taybete, lewma raste edebê zarokan bi berawird /muqayese kirin bi edebêmezînan zêdetir zelal û spehiyuk xwerû û kurte, bi curek "hêsantirîn hunere bu xwandevanî, lê sexttirîn hunere bo nivîserî".<sup>38</sup> Nivîsîn ji

bozarokan tenê bewe nabe ku astêpeyvû hevukan bihête xartir, lewma raste nivîskarê zarokan divê biçte rêzê zarokan û bivan mîkanîzim û têge û hevokan biaxive ku ser bi cîhan û ferhenga zarokanin, lê" Pêdvyê astî xwe bilind bike, heya bizaneçewa bozarok dinvîsî, nek biçte astê zarokan îca binvîsî".<sup>39</sup>Lewma edebê zarokan hege ligelek caranjî de digel edebêgiştî weke hevbên xuya kirin û nîşan dan lê hêjgelek taybetmendî êxwe hene "Wêje ê zarokan, beşeke nû û taze mijarê girîng ê wêjeye, xudan taybetmendiênxwe ye û ji hevcuda ye digel edebêmezinan, herçende herdû wêjeyê zarokan û mezinan ligorî huner û nigar û ruxisar carina wek hev nê hevcudayî hene li naverokde".<sup>40</sup>

Hege ji bonivîskarekî ku boxelik bigelemperî dinvîsî, normal be li dema nivîsînê de hizir li xunerên xwe nekat, lê ji bonivîskarêbiwarê zarokan wihapêdviye ku bi ciddî hizir li vê çendêbike û bizane bokîjan ast dinvîse û ewên ku ji bowan dinvîse kêne, astê rewşenbîrî û têgehiştin ûpleya xwendewariya wançewaye, Con Ayken dibêje: "Her ku nivîskardikeve navkarênivîsînê bi sirşitî wiha liser wîpêdviye hizir li xunerê neket, ji bowî/wêwihamifabexşe li berê de bsekine û hizirbike :Gelokê evpirtûke dixwîne? zarokan an mezin, her êk ji wan biçend rêkeke ji hevcuda dixwînin, ji berçend hokarekê tamamji hevcuda".<sup>41</sup>

Hege ew tekestên ku bozarokan ténivîsîn bi edebê zarokan bê bi navkirin, gelodibe edebe ne ya zarokan bi çi bê bi navkirin? xûyaye beşek li nivîskar û lêkolîner bi edebekî ku taybet nîne bi zarokan têrma edebêmezinan tînin bi kar anîn, beşekjî dibêjinedebêgiştî, tenanet têgehaedebê normal û edebêgewre salanjî tê bi kar anîn, bonimûne D.Necîb Algîlanî zêdetir têgehaedebêgiştî bi kar aniyê, 'Ebidulstar Tahîr Şerîf li beranber edebê zarokan de, edebê gewre bi kar aniyê, Mihsin 'Arif Salih li masterinameya xwe de ku bi navê(îroka zarokan li devera behdînan 1980-2004 e, li hember edebê zarokan edebêgiştî bi kar aniyê, Heme Kerîm Hewramîjî li herdû bergêpirtûka edebê mindalanî kurd de zêdetir edebêmezinan bi kar aniyê, herwihanivîskarê 'ereb Hîdayeallh Ahmed Alşaş lipirtûka xwe de bi navêalterbiye al'emiliye littifil, herwiha'Umer Mihemed Altalib lipirtûkaedeb alatfal fî al'eraq de, edebêmezinan û helbestêmezinan bi kar anîne li henber edebê zarokan û helbesta zarokan, herwiha Con Aykin lipirtûka xwe de bi navê dêçewa bozarokan nivîsî li hember helbesta zarokan û edebê zarokan de, helbesta mezinan û edebêmezinan bi kar aniyê.Herwiha Heme Salih Ferhadî li henber helbestê zarokan têgeha helbestê normal nivîsandiyê.

Bi qasî mêze kirin û xwendin û bi dûdaçuna mejî ji aliyê bi kar anîn mîna têrm herdû têgehaedebêgîştî û edebêmezinan diristin, bi sedemavêçendê hege edebê zarokan bi hemû huner û biwar û mijarêxwe ji bozarok be û sirşit û saykolojya û cîhana zarokan bê berçavkirin, îca dibe edebek ku taybet nîne bi zarokan bi watayê ku ji bohemû xelik ténivîsîn û dibe ku zarokjî bi qasî şiyar û fêr kirinêxwe, gohdarî bikin û bixwînin û mêze bikin, lewra ew edeb edebekegîştîye, li heman demda dibe zarok fêr nîke anku tupeywendî bi zarokve nebe, lewra tenê ya mezinan be, wate edebêmezinan.

Li dema nîrxandin û lêkolîn li tekestê ser bi edebê zarokan kereste û mîkanîzîm ûpîvanek tê bi kar anîn kugelek çaran ji hevcuda ye li ya edebêgîştî, lewma hege li edebêgîştî de nivîskar heya astekê zor azad be livêpeyvû wêne û rewanbêjî û mîtafor û xeyal û fantazyayên ku bi xwe bi sedema wê tekestê xizîmet dike, lê li edebê zarokan de dibepeyvû hevok û wêneyên zelal û xweru û kurt bi kar bîne.

### **2.5. Nivîskarê Zarokan û Zarokên Nivîskar**

Zarokpîştîjîya sê - çar salî, yanî ber lijiyaçûne dibistanê, ew şiyarêhineklistik û dahênanîkarî hene, eve zelale ewên ku ji bozarokan dinvîsin, zêdetir ji aliyêmezinanve tê berhem anîn, herwiha beşeke dî ya edebê zarokan, livê xebat ûpêkolan têpêk anîn ku ji aliyê zarokan û ji bozarokan tén nivîsandin, herçende evbeş bi muqaseye kirin bi ew beşên ku ji aliyêmezinanve ténivîsîn kêr û hindike, lê nabe bi tşitekî bê nîrx bê mêze kirin, wek tê dîtinjimarek zarok li cîhanê berhemê baş û bedew nivîsandine, mîna Stîfn, An û Canît... ku lijiyê 11 salîde helbest nivîsandine, herwiha her êk li Diyana, Suzan, Harî, Lura, Marlîn û Dîvid... lijiyê 12 salî de nivîsandine, herwiha di navedebê kurdîjî de ew diyarde heye û lijimareyên 492 û 510 û 511 yê rojnameya Hawkarîjî de navêçend zarokek hatîye ku helbest ji bozarokan nivîsandiye.<sup>42</sup> Letîf Helmetjî li Dîwanî mînalana de helbestê hijimarek zarok ji boser zîmanê kurdîpaçve kirine.

### **2.6. Taybetmendiyên Edebê Zarokan**

Edebê zarokanpraniya çaran ji aliyêmezinanve ténivîsîn, ku yasa û merc ûçarçove ya taybet bi xwe heye, hege tekestêedebê zarokan her bçûk kirin û kurtkirina tekestêedebêmezinan be, bi watayê ewe tê ku edebê zarokan tu taybetmendî û bayex ûgîrîngî ya xwe nîne, lê na, bi berevajî ve, nivîsînji bo zarokan û axaftin bi zîmanê wan ûpîşandana berhemek ku digel ast û sirşit û saykolojîya û kesatîyê zarok li hevbit û bersivêpîrsê sade ûgîrîngêjiyanê zarokan bit, ne bi kurtkirin an zelal kirina tekestî mezinan

nabe, ne bi bi kar anîna hinek zaravayê bi kêrhatîy navzarokan û behis kirina hinek canewer û leystok û hud... tu tekestek naçe navçarçoveya edebê zarokan, lewma şaşiyê hege wiha fêm bikîn kesek nikare ezimûnekê nû û zindî bomezinanpêşkêş bike, çanisa xwe di edebê zarokan biceribîne. Bi kurtî helbest nivîsîn ji bozarokangelekgrantire li ya mezinan bi sedema ewey" Grantirîn tşit eweye, ku nivîskarnivîsîn boêkek li xwe bijiyê bçûktir binvîse! her edîbek ku tşitek ji bozarokan dinvîse, pêdviye li navjyana zarokan de bjît, an amuşoya wan bike, hege bi xeyalji bepêdviye li cîhanê zarokan bi xeyal bjît".<sup>43</sup>

Gelek ji nivîskaran sereray ku wan serketineke pêşçavdi biyavê edebêgiştî de bi dest xweve înye, lê di biyavê edebiyatê zarokan de evserktine boçê nebûye, Con Aykendibêje: "Nivîsandin ji bozarokan dibe mîna tu hizir dikî bi hêsanî nebe".<sup>44</sup> Ihtîmale li riwaletdewiha xuya be ku nivîsîn ji bozarokan hêsantir û bê arîşe û rehtire li edebêgiştî, lê ewê ji bozarok dinvîse dibe hûr biçte navcîhanê zarokan û hezû xozge û hêvî ya zarokan bizane û haydarî li ziman û te'bîr kirina zarok hebe, tekestêdebe û nivîsîn ji bozarokan haydariya layenê derûnî û ferhengî ûperwerdeyî zarokanîjigereke, lê belê tenanetgotubêjê normaldigel zarokan boxwe hunereka taybetî dixaze, nemazegotubêjê hunerî "Gotubêj digel zarokan hunereke taybete û bingeh û rewşekî taybetî hene, gotinê zarokan hêsan û zelalin, lê belê zurbeyanpirisêwanjî barî remz û hêmayyan heye û dibe bi xwendineweka hûr û balkêş klîtekaniyan bên dest anîn".<sup>45</sup> Hemûvê berhem û mijarên edebê ku ji bozarokan tèn nivîsandinpêdviyejimareke merc û taybetmendî têda hebin, ji biwarê naverokvêpêdviye:

LayenêPerwerdeyî: Edîbêbiwarê zarokan ber li her tşit layenêperwerdeyî reçavdike, raste edebê zarokan ji sedî sed rolaperwerde nalîze û erkê edîbjî erkê bi temamênepwerde kirine, lê nabe tşitek binvîse berevajiy binemayêperwerdeyî be. Lewra edîbê zarokan dibe zarok han bide ji boxweşewîstî û kar kirin û rêzgirtin ûgirîngî dan bi canê alîkarî û bi hevrajiyan, di heman demê de reçavê buha û normê exlaqî bike û zarok araste bike ji boçake kirin û wefadarî û rastibêjî û bezeyî hatin bi candaran û hud... lê liperwedekirinjî de reçavê zimanêke narastewrast bike û xwe bi dûr bigre li ferman kirin û zimanêwiha bike û wiha neke, lewma hegepêşitir li helbest ûçîrokê zarokan de, nivîskardixabit li rêka tekestêxwe şîreta zarokan bike û dersên rewşitêxweşik û nîşitimanperwerî ûpakijî û hest kirin bi berpiristî û hud... hîn kiriban, lê li îrode bi herpîvanekeedebê û rewşenbîrî û saykolojî û civakî, vê cure edebê serketî û karîger e, ku digel zarok diaxfe û xwe bi dûr digre li we'zdan û şêurmendiya rastewrast û bi karbrina

zimanêwiha bike û wiha neke, li heman demê de digel can û wîjdanê zarokan de diaxfe û bi awayeka narastewrast rêz û buhayêxweşik û xweşewîstinî xak û welat ûogr bûn bi xwendin û hîn bûn û rahatin li ser etekêt û akarên medenî û xwe rewşenbîr krên û hud...

Zaniyariyê rast û dirist :Piraniya helbestê zarokan helbestê fêrkinê ne, bi wata rênmayî ûpererde kirin û amojgarî kirina rastewrast an narastewrast ya têda heye, an xûya kirina zaniyarî û fêr kirin û mifa bexşîne, bivê mercê ku li ser hêbê xeyal û endêşe û layenê îstatîkî û hunerî nebe "Helbestvanê fêrkar dibe dû mercê serekî têda hebin: yekem, rewşenbîrekêçaxêxwe bît û, rewşenbîriya wîjî herdû layenêedebê û zanistî be, yanîjîrî li layenê edebê û haydarîyi liçend zanistek de hebe. mercê duwemjî dibevê behre û şiyane têda hebe kuçend layenek li zanistek botekestekî helbestapaçve bike û heya radek taybetmendiyên hunerîjî bêtparastin".<sup>46</sup>

Bersivêpîrsên zarokan bidet: Ew helbest û tekestên edebê ku ji bozarokan tèn nivîsandin, zêdetir serketîne axaftin û zelal kirinapîrisê zarokan be û li bersivê dgerên, her mînagirînge lhengû karakterê navhelbest ûçîrokan xweşewîst û berinyas be li ba zarokan.Herwiha ji biwarê form û rûxisarjî tekestêedebê ya zarokan heta serketî be dibe:

Ziman û te'bîr kirin: Ew tekestê ji bozarok tènivîsîn, girînge ku ji ba zarok şîrîn be û hez bike bixune û leberî bike ûgohdarî bike.Herwiha ziman û mufredeyê ji ba zarok zelal bejê fêr bike, bi awaz û xwerû bin. Heya zarok bi drustî fêr bike "Nivîskarê zarokan dibe şiyani edebê hebe û xeyalî zarokan boxwe rakêşê û bersivê hezû meylê bidat û rêka wan bidet bi azadî ew hezû xoziya zêrên bêgotin".<sup>47</sup>

Kêş û qafiye û rîtm û awaz: Kêş li helbestê zarokan depêdviye kurt û beytên helbestan mosîqî bin ûpeyvê bi kar hatîjî li ferhenga taybetî ya zarokan hatibin standin û watayê wan aşkera be û hevok zelal û bi wata bin.

Navunîşan: Her tekestekêedebê ku ji bozarokan tènivîsîn lazime navunîşanî xweşik û zelal û nazik be.Nîşana serketina her navunîşanekjî ewe mînapênaseka kurt ya naverokê be, klîtek be bovekirina derîy ji bonavtekestê, lewma ewe me'lûme navunîşanê dîrudrêjan namo/xerîb û naxweşik xuner li xwendina tekest duwîr dike.

Mifa standin ji foliklorê: Edîbê serketî ewe mifa li kelepûr û tekestên foliklorî werbigre û bi zimanê serdem binvîse.

Wêneya hunerî: Wêneya hunerî di helbestê zarokan de dibe berçavbin, bi qasîgirîngî bi kêş û rêzband û rîtm û awaz, helbest li nik zarokan xweşikû bi çoş dike. Edîbê serketî bipeyvsureteka xemiliyu û xweşikpêşkêşî zarok dike kuçende mêze bike zêdetir têkildibe.

## 2.7. Hunerê Helbestê Zarokan

Helbest di navedebê zarokan degelegyagringe, xûyaye helbestê zarokan beşeka diyar ya edebê zarokanpêk tîne, helbestjî "Têrmekeedebî ye ûguzarşit/îbaret li hunerek dike kugotinekî statîkî ya merivye".<sup>48</sup>Jîbervêçendê û her hevok û destewajeka bi kêş û bi rêzband û bi saz û awaz, ji aliyê zarokve bi tevayî zûtirpêşwazî lê tê kirin, bonimûnebiserhateka normal an buyereka rojane hege bi awaiyeka normal ji bozarok bêbehîs kirin bandor nabin, lê hege ku bi rêzikeka edebê û komelekpeyvê bi kêş û qafiyedar û bi rîtm û awazî taybet bêgotin, xûyaye ya Duyempesintire li ba zarokan û zuwîtir tê wergrtin "Li biwarê pêgeyandinê zimanê zarok û karkirin ji bohîn bûna elfbê ûçend têrmeke destpêkiy û sade û destpêkirina nivîsînî navî xwe, pêdvye alîkarî zarok bikîn bogohrahatin li serpeyvên bi wezn û qafiye",<sup>49</sup>vêpeyvbi saz û awaza hezê zarok zêdetir dikin bogohgrtin û xwendin û hîn bûn "Lewma evcurepeyvzarok bi dengê ji hevcuda û hevşêwe aşna dike û ewejî curek li awaz û rêzband li ba zarokçêdike, heyaptir hezê wan bçte ser xwendin û hîn bûnîpeyvû wata û tşitê nû".<sup>50</sup>Herwiha serwa "şirîniyeka taybet bi helbest dide û lîgelek zimanan de dibe li xala cudakirina helbest lipexşan".<sup>51</sup>herwiha ewejî xuyaye ku "helbest bi sedema kurtî û mosîqa û awaz li derûnê miroda êdî mezin be an bçuk, bandoreka taybetî heye ".<sup>52</sup>Helbestê zarokanjî mîna helbestêmezinan bi awayekîgîştîçend cur hene:

Çîrokehelbest:Çîroke helbest li naverok deçîroke lê bi helbest hatîte honandin, lewma "Evcureyê edeb di navedebê kurdî de dîrokekîgelek kevinheye dzvire boberî danana mem û zîn êEhmedê Xanî û şîrîn û xusirewêXanay Qubadî".<sup>53</sup>Hemekerîm Hewramî derbarêçîroke helbest dibêje: "Çîroke helbest li zû de di navedebêkevinê kurdî di heye û bi awaiyeka nûjî li Zêwer destpêdike..".<sup>54</sup>

Helbesta Fêrkirinê: Helbesta fêrkirinê "her berhemeka edebê ku mebest têda hîn kirin ûperwerde be bi beşek li edebê fêrkirinê tê hesbandin, mijarê fêrkirinjî layenê exlaqî, biwarêcivakî û siyasî û hinek hunerê taybetjîpêk tîne".<sup>55</sup> Lê merc nîne her helbestekî fêrkirinê helbestêzarokanî be, bi heman awayî hemû helbestê zarokan helbesta fêrkirinî



nîne "her helbestek ku ji bozarok tên nivîsandin, helbesta fêrkirinê nîne, lê belêhinek ji wan helbesta stiran û sirûd yanjî helbesta dramayî ûçîrokin".<sup>56</sup>

Operêt: Qal kirina bûyereke angelek carançîrokeka terajîdîye, kors têda heye û bi şewazê helbest tê darşitin, operêt hunereka nû ye û "keresteyêîn serekîyoperêt helbest û stiran û qal kirina rwîdawê ye bi awaz û stiran".<sup>57</sup>

HelbestaGaltewgep/Henakan:Zarok bi awaiyekî xwazeyî hez ji gotinê xweş ûgalte û henekan dikin, Con Aykin dibêje: "bi rastî zarokgelek hez ji henekan...".<sup>58</sup>

### 3. EDEBÊ ZAROKÊN KURD LI DESTPÊKÊ VE HEYA NIHA

Destpêka edebê zarokên kurd, mîna edebêmezinan di navkurdan de bi helbest destpêkriye, helbestjî di berê de têkil bûye lew tekestên ku bomezinan tên nivîsandin di heman demê de zarojî mifayjê wergrtiye, an ji bozarok hatîne nivîsîn de ku zarok hînî zaniyariyan bike yan mijarekî ji borave bike, lê berîpeyda bûna edebê nivîsandî ji bozarokan, gel, kurd mîrateka dewlemend ya tekestêfoliklorî heye, beşek ji van tekestanjî ji bozarokanin an beşê zarokanjî têda hene.

Bi qasî ku tê zanîn li dîroka edebê kurdî de yekem tekesta edebê ku ji bozarokan hatibe nivîsîn, tekestê Ehmedê Xanî ye bi navê Nûbara Biçûkan, piştira tekestê her êk ji Şêx Marfî Nodîû Mewlewî û MihemedBaşqe û hud... tê, piştira li destpêka sedisala (20) an deçîrok û helbestê dî hatinpeyda bûn.Di navwanjî de, çîroka kelekukê'Îsa 'Elî mîna yekemçîrokê zarokanî ku bi zaravayê kurmanî nivîsandiye ûpiştira ji aliyêGîwî Mukriyanîve hatîte wergerandin ji bosoranî, herçnde hinek ji lîkolîneran ewçîrok ya 'Îsa 'Elî biçîrokekê tam tewa hunerî nahesbênin, Heme Kerîm Hewramî dibêje: "Lidestpêka salên40an li sedisala burî de binaxeyaçîrokê zarokên ji alêiyêNuredîn Zaza hatiye danan".<sup>59</sup>Navhatî herdûçîrokê Nuredîn Zaza ku lijimarên 30 û 32 î kovara hawar de hatîne belavkirin weke belge bi kar aniye, lêNewzad 'Elî Ehmed dibêje: "Çîrokê'Îsa 'Elî yekemçîrokê zarokê kurdîye".<sup>60</sup>

Derbarê yekem helbestê zarokanejî li helbestekî Emîn 'Alî Bedrxan destpêdike ku li sala 1906 an de hatiye nivîsîn û li sala 1919 - 1920an de lijimare6 ya kovara kurdistan ya stembolê hatîte belavkirin, piştira li kovara hawar jî li şamê careka dî hatîte

belavkirin. Herwihapîştî salên 20an li sedisala burî de helbestê zarokan li başûrê kurdistanî û bi zaravayê soranî derket.

### 3.1. Foliklora Kurdî û Edebê Zarokên Kurd

Edebêfoliklorî kurdî kupêk tê ji efsane, îpoşiya, helbesta lîrîk bi hemû beşên stiranên û lorîka daykanjî, herwihapêk tê ji gotinapêşiyên û qsey nesteq ûgalte ûgepû Metelok.<sup>61</sup> ku beşek ji wan taybetin bi zarokan û beşekjî bi qasî ji bomezinanin, ew qasjî ji bozarokanin. Bêguman foliklora kurdîpri dewlemende herwiha "Êk ji sedema dewlemendiyajî hebûnaçend zarava û beşe zaravayê di zimanê kurdî de".<sup>62</sup> herwiha lîstik lijiyanê zarok de cihê taybetî ya xwe heye, lewma "Lîstik amûrek nîne ji boderbaz kirina dem ûjiyanê, lê belê mîna avû hewa û xarin, bandoragirîngli serjiyanê hene".<sup>63</sup> Lewra li nivîsîna dîrokê edebê zarokên kurd de tu caran nabe evmijarêgirîngbê ji bîr kirin.

Tenanet di navfoliklorjî de an di navfoliklorê kurdîjî de divêvê beşê bê cuda kirin ku ser bi foliklorê zarokane, lê li berê de divê ewpiris bikîngelofoliklorê zarokan çî tşîte?geloew berhemên mîletkîjîvedigre ruwîdaw û lihingû qebare û ziman û qal kirin û hud...î nêzî sirşit û saykolojya û cîhanê zarokanin, an nikarîn bi temamî beşa zarokan ji ya mezinan bê cuda kirin? ligorî hinek lêkolîner mîna Nahîde Ehmed dibêje derket heya nihabersivekî hûr û zanistî wiha nîne.<sup>64</sup> Bi kurtî beşek ji tekestên foliklorî kugelek xweru û kurt û hêsan û spehiyukin ku dikevin navheqayet û lîstikên mîletkî/gelekî dibe mîna beşa zarokan di navfoliklorê bînan bi navkirin, gelek caranjî karakterên navvê tekestan candar û tşîtê xeyalîne an lîstikêpêşbazî û merc kirin û metelok û hinek curê sporê û bilezvegotinin, beşek ji berhemêfoliklorîjî hevparin di navbera zarok û mezinande.

Bonimûne ew heqayet û destanên Pîremêrdê helbestvan nivîsandine mîna dwazde siwareyê merywan û mehmûd axay şiywekel û şerîf hemewendî herçend tu dem nehatînegotin taybetin bi zarokan, lê ziman û riûdawê navbiserhatan bi zarokan ne xerîbin ew qasjî aloz ûgran nîne heta zarok fêmanekin, her Pîremêrd li destpêka dwazde siwareyê merywa de dibêje: "Ez zarok bûm, herçend destana diwazde siware ji bomin dihatbehis kirin, ez bi xwe bivê zarokiyêxwe bi lihengek dzanî...".<sup>65</sup> Ewejî belge be boher tşitekî belgejî ye boveçendê ku destanê navbrî li asta şiyân û fêmanekinê zarokan de ye.

Ew lîstik û stiran û serboriyê navfoliklorîjîgelek caran li navçeke kurdistanêdigel navçeyeke dî ji hevcudane lê derbarê naverok û meramê wek hev, "Pend û qseyênesteqê

kurdî li her navçek bigrîn li navçeyên kurdistanê navekî taybetî hene ku li biwarê ruxisar ji hevcuda ne lê li naverok de boêk meram tên bi kar anîn".<sup>66</sup>

Herwihalîstikpişkekemezin li foliklorê kurdîpêktîne "Lîstikbeşeke serekî ya edebêfoliklora kurdiye, curek bizavû sporjî têda hene, çalakî bi laşê didin",<sup>67</sup> ku heinek ji wan taybetin bi keçan û hindekjî taybetin bi kuran, hinekjî ji boherdû regezanin, "Hinek ji van lîstikan li mala û xanî yê akincîbunêdihatî kirin û bi taybet li şevên zivistanê û hinek dîjî li derveyê mal û xanîy dihatin li darxistin kuji ber livîn û hereketê mifa têda hebû bu laşê zarokan û mîna spor û leş saxiyek dihatê hijmar...".<sup>68</sup>

Bonimûne ji lîstikek de ku bi tlîkên destî dihatin encam dan, zarok digotin: qlînçk, babelînçk, doredrêje, şadenwêje, espêkuje, anku heman lîstik bivê awayî dihatgotin: tute, bratute, berizelute, doşawmje, espêkuje, bi heman awayîstrana horuvî ruvî ku zarok bi hevra rudinîşin û dibêjin:

Horêwî rêwî  
Hê hê  
Rêwî bê îman  
Hê hê  
Şerîkî şeytan  
Hê hê  
Qele smore  
Hê hê  
Le deşitîçole....<sup>69</sup>

Herwiha beşeke dî ji edebêfoliklorî zarokan bigelemperî û edebêfoliklorî zarokanî kurd bi taybetî helbest û lorîka daykane ji bozarokan, tenanet dameziraweya Yuniskoli sala 1999 an de diyar kriye ku "Xwendinaçîrok û lorîk û metelok û zindî kirina dab û nerîtekevin û cejnên neteweyî bandorê erênî li ser hizir û hiş û akarê zarokan dibe".<sup>70</sup>

### **3.2. Rola Rojnamevaniya Kurdî LiPêxistina Edebê Zarokan De**

Bêguman yekemîn rojnameya kurdî li jêr navê kurdistan li qahîreyapaytexta mîsir li 22ê nîsana sala 1898 an de derçû, xudanê wêMîqdad Medhet Bedrxan bû, her li wî serdemî de bayex bi edebiyat û rewşenbiyê ûperwerde kirina zarokan hate dan ûpiştgoh nexist ku amojgarî û şîret û rênmayên baş û bi rumet derbarê zarokan hatine belavkirin.Wek li

sergotarêjimareêk de, Mîqdad Medhet Bedrxan ê serinivîskarê rojnameya kurdistan dibêje: "Vê cerîdêda ezêbehisa qinciya 'îlm û me'rîfeta bikim li kurdîra, mirodi 'îlme li kurdî medrese û mektebên qinc hene...".<sup>71</sup>

Rojnamevaniya zarokan, an rupel û beşên taybet bi zarokan dinavrojnamevaniya mezinanjî de, rola xwe dîtiye lipêş xisina edebê zarokên kurd, herwiha yekem helbesta zarokên kurd li rêka kovara kurdistan a stembolê li sala 1919 an de hatiye belavkirin, ew helbestejî bi navê delaliya zarokan e û kesek bi navêZînonivîsandiye, piştira heman helbest ku li kovara hawar li sala 1932 an bocara Duyem hatîte belavkirin xuya dibe ku xudanê helbestêEmîn 'Alî Bedrxan e û yekem helbestvanê kurde ku helbest bozarokan nivîsandiye.<sup>72</sup>herwiha'Usman Sebrî 1925- 1998 helbesta nazk û xweşik li kovara hawar de belavkriye,<sup>73</sup> ku stûneke taybet bi berhemê zarokan hebû li kovarê de bi navêzariwan.

Herwehaêk li rojnamiyên Rojî Kurd 1913, Pêşketin 1920, Vejîn 1920, Bangî Kurdistan 1922, Rojî Kurdistan 1922 ûJiyan 1926, herwiha kovarên Zarî Kurmancî 1925, Gelawêj 1939û DengîGêtî Taze 1943, rupelê taybet bi zarokan hebûne, di navwanjî de her êk li 'Elaedîn Secadî, Şakr Fettah û Hisên Huznî Mukriyanî lipêşxşitin û bayexdan bi edebê zarokan cihê wan diyare, herwiha Pîremêrdû Goran û destek ji helbestvanên hevçerxê wan rola mezin dîtine li belavkrina berhemêedebê liJîn û Jiyan de li nivê yekem ya sedisala bîstan.

Ji bilî beşa zarokan li rojnamevaniya mezinan de, herwiha li destpêkêpeydabûna rojname û kovarê taybet bi zarokan, girîngîyeke taybet bi edebê zarokan hatiye dan, kovara Grugalî Zarokanî Kurd kujimare lî li sala 1945 an de hatiye derxistin, li her 3jimareya kovarê dejimareka berçavli helbest ûçîrokê çend nivîskarekî têda hatîte belavkirin, li navwanjî de her yek ji Zêwer, Pîremêrd, Hêmin, Hejar û Se'îd Zergeyî berhem têda belavkiriye.<sup>74</sup>

Herwiha "Rojnamevaniya zarokan bzafekîçalak bûye û li îrojî de bzavekîgeşesendiye".<sup>75</sup>çunku ji bilî kovara Grugalî Zarokanî Kurd herwiha kovarên Stêr û Karwanî Zarokan û estêre û dehan belavokî dî rola mezin dîtine lipêşxistina edebê zarokan, herwiha lipiştî serhildana adara 1991 an de bi taybet li başûrê kurdistanêjimareka zehif kovar hatin derketin û hemûjîçend rupelek tayebit kirine ji bobelavkirina tekestên edebê ya zarokan, mîna kovarên Cigergoşekan, Perîstan, Peresêlke, Heng, Criywe, Plîstani,

Colanê, Xende ûGulekan... bi taybet kovarên Cigergoşekan, Plîstanik, Colanê, Xende ûGulekan... ku heya niha didomînin.

### 3.3. Ezmûna Edîbên Zarokaniyê kurd

Jibilî edebêfolikloriya kurdî yê taybet bi zarokan, yanî liserdemê EhmedêXanîve heya niha, me ezimûnênivîskaran boser5 qonaxanparve kriye bivê awayî:

#### 3.3.1. Qonaxa Yekem (1682 - 1920)

Ew qonaxpêk tê ji çend edîb û nivîskarek ku berhemê fêrkinênivîsîne, ew berhem çî ji bozarokan hatibin nivîsîn an ji bomezinan bin heta mezin bixunin û mifajê werbgrin piştra zarokan hînê xwendin û zimanzanî û zelal kirina hinek zanistêolî bikin, xûyaye evqonaxe li nivê duyem li sedisala 17 an de destpêdike, yanî li Ehmedê Xanî destpêdike heya destpêka sed sala 20 an didomîne.

##### 3.3.1.1. Ehmedê Xanî (1650-1706)

Navê wî Ehmed kurêEliyas kurêRosteme û berinyase bi Ehmedê Xanî, li sala1650 an de li bajêrê bayezîd li bakûrê kurdistanê li dayk bûye û li sala 1706 an de koça dawî kriye, hizirvan û helbestvanekî mezinê kurde û xudanê şakara mem û zîn e, ew helbestêolî û neteweyî û nişitimanî zorî nivîsandiye, herwihaEhmedî Xanî mîna mamoste ders li medresan de daye,ferhengekî ji bozarokan nivîsandiye bi navêNewbuhar an Nûbara Bçûkan, ku ferhengekî kurdî-'erebî ye, evferheng ji pêşgotinekû sêzdeparça û dumahiyek/xatmepêk tê, bi şêwazê hozana fêrkinin ji bowêçendê ku zarokên kurdan fêrî zimanê 'erebî bin.Lewra Nûbar diçe xaneyê helbesta fêrkininê û bi yekem nivîsîn tê danan ku ji bozarok hatîte nivîsîn, ew berhem li sala 1094êK. de ku hemberî 1682ê Z. hatiye nivîsîn.<sup>76</sup>Ferhenga Nûbara Bçûkan li zêdetir li dû hizar mînakanpêk tê û li destpêkê de dibêje:

Jipaş hemd û selawatan  
 Evçend kelîmene ji luxatan  
 Vêkêxistin ehmedê xanî  
 Navê nûbara bçukan lê danî  
 Ne Ji bosahîb rewacan  
 Belke ji bobçukêt krmancan.<sup>77</sup>

### 3.3.1.2. Mela Xidirî Riwarî (1721-1781)

Mela Xidirî Riwarîprtukekî fêrkirinê bi helbest danaye bi zaravayê(Goran î), ewprtuk bi nava Role Bizanî ye û mînaSdıq Borekeyî dibêje: "Wa xûyaye bokurêxwenivîsandiye li qalbeke rêk ûpêk û bi sanahî û zelalî hatiye danan".<sup>78</sup>Bi kurtî mebest li Role Bizanîjî de fêrkirin û haydarkirina zarokê kurde bi bîr û bawerêolî,li destpêkê namîlekeyê de hatiye:

Role bizanî, role bizanî  
Ferizen werceşit mebobzanî  
Esl û fer' û dînçenî erkanî  
Çenî ehkamanpey musulmanî.<sup>79</sup>

### 3.3.1.3. Şêx Marfî Nodê (1753- 1837)

Şêx Marfî Nodê ku li sala 1753 an de ligundê nodêîgrêdayê şarbajêr li başûrê kurdistan li dayk bûye, li sala 1837 koça dawî kriye.<sup>80</sup>Ewjî ferhengeke 'erebî \_ kurdî mînaEhmedî Xanî bi helbest bozarokên medrseyaolî danaye bi navêEhmedî, ku boehmedê kurê xwe danaye yanî -Kak Ehmedî Şêx-, ew ferhengjî ferhengeka kurdî-'erebîye û li dû beşa serekîpêk tê, beşa yekem şîrove kirina watayên hinekpeyvên 'erebîye, beşa duyemjî ku tenê 17 mînake boşerih kirin û rave kirina hinek rukin û fermanêolî ye. Destpêka Ehmedî bivê awayî destpêdike:

Ra's sere. 'încawe  
Beden: qalib îsm nawe  
Enif lûte hacib biro  
Fxizrane.rukbe: ejno  
Cebîn û cbihe: tewêle  
Mkir û u keyd û hîle: fêle.<sup>81</sup>

### 3.3.1.4. Mewlewî (1806-1860)

Herwiha Mewlewîjî lipirtûka 'Eqîde de, ku ji bozarokanî nivîsandiye, ew 'Eqîde qesîdeyeka drêje û li 110 malîkpêk tê û li ser kêşê de kîteyî hatîte danan, mîna Mihemed 'Elî Qeredaxî dibêje: "Gelek hêsane û bi kurdiyêke zelal ji bozarokên kurd hatiye nivîsîn".<sup>82</sup>Di'Eqîde de erkanên îman û îslamê hatiye rave kirin, li destpêkde û li nêzîkey sed malîkan de şîroveya erkanên îman dike û bivê awayî destpêdike :

Îman bawere ba lêt neşewê  
We şeşçt ewê îmant bwê

Ewwel bzane xuda be heqe  
 Bê mewa û bêçûn ferdî mutleqe  
 Bê mîsl û şerîk bê daye û ferizend  
 Bê cêge û, hazir, bê bab ûpeywend".<sup>83</sup>

HerwihaMewlewî li heşit malêkên dîmahî de behisê erkanên îslam dike û dibêje:

Ewwel bizane îslampênc rukine  
 Ewwel lewpênce baweri krdine  
 Dûhem nwêje tomebogîre  
 Niwêjîpênc ferize wecê bêre  
 Rukinî sêyemîn bomusulmanan  
 Wacbe rojuwî mangî remezan  
 Rukinîçwarem serfitire û zekat  
 Bîdey wekesê wacb alixîrat  
 Pêncemîn hecce xasî bzane  
 Hec wacb Leser delet mendane  
 Dewlet mend: ewey beş bika malî  
 Toşuwî rêgey xoî, xercî mindalî  
 Esl û fer'î dîn îman û îslam  
 We tewfîqî heq axir bû tamam  
 Sa xuda we 'îşqîrî terîqet  
 Tewfîqman bidey borêî heqîqet.<sup>84</sup>

Girînge bêgotin, her êk ji nivîskar û helbestvanê qonaxa yekemûgelek tekestê dîyê milletan zêdetir bipexşanê menzum tên hesbandin, jêtirîn nimûnejî di navedebê 'erebî de (Elfiye)yê (Îbin Malîk) e ku bi awaiyeka cot qafîye hatîte nivîsîn,<sup>85</sup> û 'erebjî hsêbêpexşanê menzum ji boberhemê navborî dîkin.

### 3.3.2. Qonaxa Duyem (1920 - 1950)

Edebê zarokan bi awaiyeke hunerî li sedisala 20 an destpêdike, bi taybetî li başûrê kurdistanê "Edebê nûsiraw ji bozarokan, bi diyardeke nû tê danan li başûrê kurdistanê, li destpêka sedisala 20anpeyda bûye...".<sup>86</sup> Li vê demê de ku Zêwer, Pîremêrd, Bêkes û Dildar... destpêk zêdetir bi sirûd destpê kriye ku ji dibistanan bozarokan dihat nivîsîn.

Herwek destpêka serdema Zêwer, Pîremêrd, Bêkes, Dildar.. bi qonaxa sirûd tê navbrin "Lewma ew helbestên livê serdemê ji bozarokan dihat danan berî her tşitekî hizir li xwendekar dihat kirinçawavê sirudê bstire yanî bi awaz bêje ".<sup>87</sup>Lijêr de bi kurtî navêhinek li edîbê diyarêvê serdemêtînin ku rola mezin dîtine li damezirandin ûpêşxistina edebê zarokan bi zaravayê soranî:

Zêwer(1875- 1948), Pîremêrd (1867-1950), MelayêGewre (1876-1943), 'Ebidurehman Begî Baban (Babe 1880-1967), MuftîPêncwînî (1881-1952), Şakr Fettah (1914- 1988 ), 'Elaedîn Secadî (1915-1984), Husên Huznî Mukriyanî (1893 - 1947), 'Ebidulwahîd Nûrî (1904-1944), Bêkes (1905-1948), Şêx Nûrî (1896- 1958), Dildar (1918- 1948) û 'Ewnî (1914-1992). Herwiha bi zaravayê kurmançîjî her êk ji Kamîran Bedrxan (1895-1978) û Cgerxwên (1903- 1984) hud...

Zêwerê helbestvan bi êkem helbestvan tê danan ku bi zaravayê soranîpiştî ezimûnê edîbên qonaxa yekem sirud û helbest bozarokan nivîsandiye. lewra li beşa sêyem livê lîkolînê de berhemên Zêwergengeşe dikîn.

### **3.3.3. Qonaxa Sêyem (1950 - 1970)**

Ev qonax bi Goran destpêdike, jimarekî berçavli helbestvan û edîbênvê serdemêpşkarî lipêşvebrina edebê zarokên kurd bi tevayî û helbesta zarokan bi taybetî kirine, mîna: 'Umer 'Ebidurehîm, Fereydûn 'Elî Emîn, 'Umer 'Elî Emîn, Kakey Fellah, E.E.Şewnim, Zekî Henarî, Îbrahîm Ehmed Şwan, Îbrahîm Emîn Baldar, Hejar, Remzî Qezaz, Fazil Qeftan û Medhet Bêxew hud... hemûvê helbestvan û edîbê hatin navbrin bi cîlêpiştîGoran tên hesbandin, li qonaxa sêyem degohartin bi ser ziman û form û naverokê helbestan de hat û zimanêke zelaltir û nûtir hat meydan.Ew ziman heya naverasta salên heftayan li sedisala borî de berdewam bûye.

Bêguman helbestvanê bi navû dengGoranbi raberavê qonaxê tê danan, li beşaçaremêvê lîkolînê de, bi drêjî behisa ezimûnê wî dikîn.

### **3.3.4. QonaxaÇarem (1970- 1991)**

Evqonax kupiştî derçûna beyaninameya dîrokî ya yazdeya adarê tê li sala 1970 an de li 'êraqê, ku astek li azadî ferahem hat ûvêgohrînjî bandor kire ser rewşa nivîsîn û rewşenbîrê li navçeyê de, di navwanjî de edebê zarokan bipêşketinekenû hate qada nivîsînû belavkirin, helbestê azad zêdetir bû, ziman zelaltir bû, naverokvekrîtir bû, livê qonaxê de her yek ji



wan edîban beşdariyapêşxistina edebê zarokan kirine: Mihemed Mewlûd Mem û Aferînî Hawjînê wî, Mewlûd Îbrahîm Hesên, Cemal Nûrî, Muhsîn Cwamêr, 'UmerPetî, Îsma'îl Rojbeyanî, Kemal Mamend, biçîrokîjî her êk ji Daykî Solav, Rostem Bacelan, 'Ezîzî Melay Reş, Letîf Helmet, Kazim Koîyi û 'Usman Hewramî..., di navwanjî de ezimûnê helbestêLetîf Helmet cih ûpêgeyê herî diyarî hene, lewra beşeke taybet ji boaxaftin li form û naveroka helbesta Helmet livê tezê de hatiye terxan kirin.

### 3.3.5. Qonaxa Pêncem (1991- Heya Niha)

Herwihapiştî serhildanê buhara 1991 an de li başûrê kurdistanêjimareke gelek zêdetir navû edîbê nû derketin, gelek helbest ûçîrok ûoperêt û şanoname hatine nivîsîn û wegerandin, beşek ji wan helbestvan û edîban ewin: Îdrîs 'Ebidulla, BekrPşderî, 'Elî Bextewer, CemalGrdesorî, Brwa Muhemmedî, 'Elî Hemereşîd Berizncî, AkoMihemedSabîr, Sozan Sofî, Serheng' Ebidurehman, Hatem Batasî, Zara Ehmed Caf, Rostem Xamoş, 'Ebidulwehab Şwanî, Ziyad Reşad, Daykî Xelat, Emîn Mihemed, Rewf Cemîl, Ferhad Ehmed Berizncî, EmînGerdgîlanî, 'Ebidurehman Fehîmî, 'Usman Derwêş, Pakîze Mihemed'Elî û Selah Nîsarî û hud..., ku li navwan deEmîn Mihemed bi ezimûneke dewlemend û ji hevcuda digel zarokan diaxfe, ji bervêçendê li beşeke taybetde li ezimûnê helbestêEmîn Mihemed diaxfin.

## 4. ÇAR HELBESTVAN

### 4.1. Zêwer (1875- 1948)

#### 4.1.1. Yekem: Jiyana Wî

Navê wî 'Ebidulla kurêMihemed efendî kurê mela Resûle, berinyas bi Zêwer, li sala 1875 an de li bajêrêSilêmanî li başûrê kurdistanê li dayk bûye û li esl de xelikê navçeyaPşdere, ligorî hatiye riywayetkirin Zêwer li Silêmanî, Bane, Mukriyan, Riwandz, Hewlêr û Kerkûk xwendiyê û desturinameya 'ilmî standiyê, serdanê stembulêpaytextê hingiy dewleta 'usmanî kriye û maweya4 salan li wir maye,piştiravegeryaye slêmanî, lewra ji bilî zimanê kurdî, zimanê farsî û 'erebîjî ku mîna melayekî zîrek bi drustî zaniye, herwiha bi sedema xwendin ûçûn ji bostembolê haydariyekî baş li ziman û edebêtirikîjîpeyda kriye, ew êk bûye livan helbestvanan ku li Şêx Mehmûdî Hefîdvegelekî nêzik bûye.Maweke zor bipîşe mamoste bûye heya li sala 1938an de hatiye xanenişin teqa'ud kirin,<sup>88</sup>Zêwer bi zimanên kurdî, farsî, 'erebî û tirikîjî helbest nivîsandiye. ji bilî dîwanê helbestan herwiha ku hemû helbestên wî tédane, herwihajiyaniyameyapêxemberan û ferhenga 'erebî-kurdî

ûçîrok û wergeranjî hene,<sup>89</sup>herwiha li biwarêedebê zarokan de nivîsîn û wergeran heye, beşek li helbestên wî ji bosirûdan hatîne nivîsîn û ji aliyê xwendekaran li dibistanan de hatînegotin, herwiha li dîwanê wî deçîrokehelbest ûgalte û gepûgotinê bi mifa û metelokjî hene. Ew li sala 1948an de her li slêmanî û lijiyê 73 salan de koça dawî kriye.

#### **4.1.2. Zêwer û Helbestên Zarokên Kurd**

PişkdariyaZêwer li nivîsîna helbestan ji bozarokan û danana sirûd boxwendekarêdibistanangelek mezin û berçave, dibe sedema herî diyar yavê beşdariyêgirîngyêZêwer bovêçendêvegere ku beşa zorî yajiyanaxwe bi mamostatî derbas kriye, livê qonax û serdemêjî de edebê zarokên kurdgelek kêr ûjar û destkurt bûye, lewra helbest û sirûd û stiranê zarokan bûye beşeka mezin lijiyanaedebî û rewşenbîrî yê wî de, herwihapaşketina komelgeha kurdan li xwendin ûçûne dibistanê livê wextê de, bûye sedemavêçendê, mijarê nîşitmanperwerî û xweşewîstî welat û xebat ji boazadî û herwihaxweşikî û bi bereketî xakê kurdan bibe bi mijara herî serekiyê naveroka helbest û sirudên wî.

Ew tekestên Zêwer ku taybet ji bozarokan hatîne nivîsandin û mîna beşek li edebê zarokan tên hesbandin, digel berhemên dî yên wî ku bomezînan hatîne nivîsîn, li dîwanê wî de nehatîne ji hevcuda kirin, lê belê hemû helbeste zarokanî û ew helbesên wîjî ku bokirine sirûd li dibistanan de hatîne nivîsîn û beşek livê helbestêjî ku bi naverok neteweyî û nîşitimanîne, bi hevra li beşekde bi navê goranî û sirûde nîşitimaniyekan, hatîneçapkirin, herwiha beşek lew tekestên Zêwer kuçîrokehelbestin an li zimanên dî hatîne wergerandin û ji bozarokan li hevhatîne, li komeleya stayş ûpiyaheldan hatîne cîh kirin, bêguman ewejî karê lêkolînê ji bolîkolînerangiran kriye, li servêmijarêHisên Befrîn dibêje: "Lazim bûhelbestên Zêwerî ewên ku taybet ji bozarokan hatîne nivîsîn li beşekae taybet û cuda hatîban danan û têkil beşên sirudanû helbestên siyasî û civakiya din yê helbestvanî nehatîban kirin".<sup>90</sup>Herwiha beşekjî livê helbestên nîşitimanî ku tupeywendiyên bi zarok û edebê zarokanve nîne livê beşê de hatîne danan.

#### **4.1.3. HelbestaPerwerde û Hînkari Li Berhemên Zêwer De**

Mijara perwerde û hînkari û handanê zarokan boçûne dibistan û xweşewîstî yêpênûs û pirtûk û tînûsan, êkek ji wan babetan ku li helbestên zarokanî yêZêwer degelek tekez li ser hatîne kirin.Li navwanjî de mijaraperwerdeyaolî û nîşitimanî û hînkari û sporê berçavdikevin, livê helbestêjêr de ku mîna helbestekeperwerdeya hînkari tê bi navkirin,

Zêwer li rêka helbestêdixaze deris û xwendin û zanist û fêrbûn li ba zarokanxweşewîst bike:

Min mindalî bçûkm mektebe roh ûserm

Be se'î û xoşî xoşî dersm ekeme berm

Se'îger mandûm eka şadm dersm rewane

Mindalê ke temel bê xwêrî naw kolane

Dinyaçawî roşn bû be sayey 'ilm û fen bû

Ey refîqanî mekteb rojî 'ilm û 'îrfane

(Dîwanî Zêwer, R.182)

Helbesteke dî ya Zêwer ku hem li biwarê naverok bi zarokan ra aşnaye, hem li biwarê formjî kêşê wîgelek drêjnîne ûjimareyê malîkan zêde nîne, helbesta Qsey Şagrdêk e, ewjî helbestekîperwerdeyî ye û ji bozarokan dibêje:

Hemû beyanî ke le xew hestm

Pak eyşomçawu riûmet û destm

Befru ba nebê serîşm eşom

Yek dûparçe nan beçawe exom

Clî şewnûstin le xom la ebem

Be clî mekteb beden rêk exem

Emca heldestm boçûne mekteb

Erom berêwe be heyaw edeb

Defter û ktêb qelem heldegrm

Be wrde wrde rêy mekteb egrm....

(Dîwanî Zêwer, r.181)

Li helbesteke dîya kurtjî de bi navê Qisey Xwêndkarêk, nîşitiman bi mal û mamoste bi bab û mekteb bi dayk dişbîne, kurd bi nûrêçavbi navdike û xwendekar û zarokan han dide ji bokar û xebat, mîna divê helbestêjêrîn de xuyaye:

Ême minalîn: weten malmane

Mamosta bawk, mekteb daykmane

Qutabî hemû wek bramane

Kurdî xoşewîst nûrîçawmane

Ebê têkoşîn emiromerdane

Çunku wetenmançawî lêmane

(Dîwanî Zêwer, r.185)

Herwiha li helbesteke dî de bi navê Xiwêndkarî Sen'etkar -Dartaşî, li ser zimanê xwendekarekî ewepîşan dide ku hem dersên xwe dixwîne û hemjî li karubar ûpîşeyê rojanede karker ûostaye, herwihadibêje xwendin û sen'et qedrêxwe hene:

Ke rojbêtewe min sen'etkarm

Sahîbî rende û teşwî û mşarm

Ke şewm lê hat emin qutabîm

Qelem û qaqez ktêbe yarm...

(Dîwanî Zêwer, r.193)

Livan helbestan de ku bohandan / teşcî' kirin a zarokan nivîsandiye heya biçe dibistanan û bixunin, zêdetir tekez livêçendê kriye ku lazime digel kuran de, keçanjî biçe dibistanan û hînî zanist û zaniyarî bibin û bawerîname bi dest xweve bînin û kar bikin, mamoste Necmedîn Mela derbarê ew mijardibêje: "Her mamoste Zêwer bû bi stirana kurdî nîşitmanî zimanê zarokên kurdîpijan, çunku demeke drêjbû keçên bestezimanê kurd bi nexundewarî mîna balindeya bal şikestî bûye, her mamoste Zêwer bû bi helbesta şirîngote keçû kurên kurd ku biçe dibistanan û bixunin û çavê wanvekrî be daku lipaşerojê de bibin diyeka dilsojku bikarin zarokêwihaperwerde bikin xelikmifajî /jê wergrin".<sup>91</sup>

Lihelbesteke dî ya hînkari de ku li 38 malîkpêkhatiye û behis li cugrafîya dike, evhelbest mîna derseke cugrafîyaya welatê 'êraqê ye û destpêkbehis li navçe û lîwayên ji hevcudayên hingyîdike:

Be sê mentîqe 'îraq beş kra

Şîmal û weset cînbawnra

Hemû şarêkîpê elên liywa

Çwarde liywaye bînrane herwa

Çwar lem şarane kewtûte şîmal

Silêmanîye û kerkûkî xoşhal

Hewlêr û musl şarî meşûrin

Be zira'et ûsen'et mesirûrin

(Dîwanî Zêwer, r.187- 188)

Piştira behisê sînûrêrojhat û rojava û bakûr û başurê 'êraqêdike, piştirabehisa îdare û curê fermanrewayî ûpaytexta welatêdike, îca qalaçavkanî û rêrewî herdû ruwîbarên serekîyên 'êraqêdike ku dicle û furatin, piştî ewe behisê bazirganî û li dîmahîjî dejimareyaxelikê 'êraqî dînvîse:

Çîwar milîon debê nfusî 'êraq

Ruwî le ziyadîye be emirî xellaq

(Dîwanî Zêwer, r.190)

Herwiha her livê helbestên ku Zêwer ji bozarokan nivîsandine zarok hînî hisêbêjimare û dîrsa matmatîk dike. Helbest nivîsandiye ji bohîn bûna rojên heftî, pesinî karê bijîşk dike, têda erkê bijîşk û mafê nexweş diyarî dike. behisê demjmêrêdike mîna amûrek ku bodiyarî kirina deman û ewe radgehîne ku demjmra wîgelek bi kêre mîna hevlekî ye, herwihabehis li rêkxistina dem dike û dibêje ewên demên xwe rêk nîke krdarê wîjî rêk nabe :

Se'atekey min ciwan û bekare

Roîyinî weqtan dekajimare

Ke dewrey şew û rojî tewaw bû

Dûbare sazî ekem zû bezû

Paş ûpêş naka be yek deqîqe

Zorim xoş ewê weku refîqe

Her karm bê bewî rêk ekem

Be tertîbêkî zor baş û mehkem

Her kes be tertîb rêk neka karî

Rêkupêk nabê hemû krdarî

(Dîwanî Zêwer, r.194)

Beşek ji tekestên zarokaniyê Zêwer, çîrok û biserhatê candaranin, li navhelbestanjî de navê ruvî, pisîk, hiriç, meymûn, beq, kevuk, qirik, tawus, çvîk, bulbul û mêş hnguv...hatîye. li helbesta (heng)depesinêvê candarê bçkuk dike, ku xudan zîrekîyeka bê sînure, ewejî behisdike ku di navgelê mêş hnguvan de, her êk kar dike û cihê tembel û karinekeran nîne:

Eger bgerêî lenaw ew mulke

Temmel nemawe bê îş fêwtawe

Herçî temmel û yaxud bê îş bê

Be qanûn nefîye weyan kujrawe

(Dîwanî Zêwer, r.201)

Li helbesta dû rêwî tema'kar de, bi helbestçîroka dû ruvî yê birçî qal dike ku li encama nekokî û li ser tema'a mala dunyayê şer dîkin, piştira bazekpeyda dibe ûpenîrê wan direvîne:

Dû rêwî zorizan herdû teme'kar

Le taw brsêti bûn be segî har

Biyane diyaye eger kale kun

Wayan ezanîgoşite û hîze riûn....

(Dîwanî Zêwer, r.195)

Li helbestapişîley riyakar de, behisêpişîkeka riyabaz dîke ku ji bonan û rûnî duvêxwe bilind dîke û xwe xweşewîst dîke. Herwiha li helbesta hemû şitê qise eka de, ewe ji bozarokan dibêje ku ji bilî mervan candaryê dinjî diaxfîn. Li helbesteka dî de serburdeya tawsî behisdîke kugelek li xwe raziye.

Li helbesta urçî xetîb û meymûn de, behisê hirçek dîke ku li navcandaran de diçe ser kursî ûgotarpêşkêş dîke, piştira meymûn têdixaze heman rola hrçî bilîze, lê hirçew tşit qebîl nake û hêris dibe:

Lenaw drinde ûgiyandarî wehşî

Nêre wrçêkiyançuwe ser kursî

Xutibey destpêkrd botêgeyandin

Îşarey ekrd bedest culandin

Berast ûçepda xoî helesuran

Bedengêkî zl wekga eyboran

Eywt le wextî xeşm û xezeba

Xotan lameden lerêî edeba

'Îlm sîfetî xway bê hawtaye

Hita dibêje:

Komelî wehşî bilau bûnewe

Bocêge û laney xoyançûnewe

Eyan wt ême le şeri dûr eka

Keçî le şera xoî renceroeka

(Dîwanî Zêwer, r.201-202)

Herwiha Zêwer tekesta helbestvanî navdarê Firensayî Lamartîn (1790-1869)î li tirikîve wergerandiye boser zimanê kurdî, ku têda biserhatê camêrekî kal behisdike ku li şax de dar kom dike, camêrê kal li hejmet kar û mandî bûna xwe ji xwe ra dibêje ay Melekulmewt tu li kuderêy de ku le nexweşî û derdêjyanê min derbas bikî, êdî livê demê de Melekulmetpeyda dibe û dibêje kermke tu tşitek dixazî? ewjî bi tirs û neçarî dibêje barê mingelekîgirane ji kerema xwe alîkariya min bike de ku bixem ser milêxwe:

'Îziraylî beheşitî

Kolî naye serpiştî

Emcapîre beyek xar

Kolî frande naw şar

(Dîwanî Zêwer, r.248)

Herwiha Zêwerjimarek helbestanjirebîve wergerandîne boser zimanê kurdî pêşkêşî zarokên kurd kirine, êk ji wan tekestê helbestvanê navdarê bi 'erebî nivîs Ehmed Şewqî ye bi navê kotir û rawker:

Kotirêk lenawgoşey hêlane

Emîn bû le dest xedrî zemanê

Rawkerêk rojêk boraw le sehra

Be dewrî baxda ta, twanîgera

Zorgera sayey teyrîşî nedî

'Aciz bûgerawe, bomeqsedî

Kotir xoî derxist lenaw hêlane

Ehmeqî derdî bebê dermane

Le axirî xoî nezan bû lewê



Bangî krd însan etuçît ewê?

Rawkergerawe ruwî krde lay deng

Le ruwî sahîb dengboî ragrt tifeng

Be teqey tifengser berew xwar bû

Kewtejêr demî kêrd ûçeqozû

Way wt: ke kewte ew msîbete

Ziman bwestî ser be rehete

(Dîwanî Zêwer, r.202-203)

#### 4.1.4. Zêwer û Sirûdê Dibistanan

Sirudên Zêwerî ku ji dema xwe de bodibistanan hatîne nivîsîn û ji layê zarokan hatînegotin, herçend weke ziman û naverok û mijar bi kurdîne, lê rîtm û awazê sirûdan ji stiranêtirikî û 'erebî hatîne standin. Beşek li naverokê sirûdan dersê zanistî ya xwendekarandin, herwiha hreçend hemu sirudên wî ji bozarokan hatîne nivîsîn lê bi temamî ûpirupiri zarokanejî nîne, lewra dibe ji bomezînanjî bin û ji aliyêmezînanjî bêngotin û xwendin, Husên Befrîndibêje: "Beşek livê helbestan ku bi mebesta sirûd hatîne nivîsîn û her êk ji wanjî ligorî awazekî hatîne danan ku livê serdemê de 'adet wiha bû, mîna tekestên: Ey kurdîne ey merdîne, fexire boême kurdistan, wetenî min kurdistane, wa weten xemilywe, ey weten, ême ke minal û necewanîn, 'esiru zemanî xwêndine, Goran î felah".<sup>92</sup> Zêwer li sirûdê ey weten de dibêje:

Wa weten xemilywe wekgul newbeharî mîllete

Şadmanî qewmî kurde wextî lutif wrehmete

Zereyêk xakî weten nadem be qesirî qeyserî

Cumile eniharî weku kewser heway wek ceninete

Mîlletî kurd maskî serbestîyi xiste destî xoî

Can nîsarîger neka her kes beşî ew le'nete

(Dîwanî Zêwer, r.172)

HerwihaZêwer ligelek ji helbestan de ewên bosirûd hatîne nivîsandin, nîşitiman bi biheşit û baxêxweşikdişbîne, avû hewa û xak û asmanê welat bi bedew û bilind û şîrîn bi navdike, herwiha bi zarok û xwendekaran dibêje nîşitmana me dibe em can û dilêxwe ji bo bikîn feda, em hemû şanazîn bivê nîşitmanê ku yadgariya bavû kalê meye:

Wetenî min kurdistane, yadgarîyi ecdadmane

Beheşitî ruwî ser zemîne xakîpakî kurdistane

Ba hemûman wek bra bîn refîqî dîn û dinya bîn

Ba le wehşet tewella bîn nobetî 'ilm û 'îrfane

(Dîwanî Zêwer, r.174)

Ew bi xwendekaran dibêje hegejiyan û canek lipênavnîşitiman û kurdistan de bexit nekîn û ji boxizimeta hevîşitimanîyaxwe bi kar neanîn ji bomirîne başe:

hewl û koşşm lazime, boxizimetî hawmîlletm

rohê le rêgay mîlleta, neybexşm eynêmeçal

ta dest le mil hiywa nekem şerte nenîşm qet betal

bolawî tazey qewmî kurd bibme nimûney bê mîsal

(Dîwanî Zêwer, r.171)

Zêwer li helbestên xwe deçewa bi xakêkevinarê kurdistanê şanaze, wihajî bi kesên navdarê dîrokî ya kurdan şanaze û bi bilindî navê wan aniye, mîna Sultan Selahedîn û Kerîm Xan:

Slah Aldîn sultan, Kerîm Xan şahî êran

Nadr Şahî hukmîran, hatewe yadî kurdan

Azadîman dawa krd, serbestîmanpeya krd

Orduwî kurdman însa krd...

(Dîwanî Zêwer, r.178)

Li beşên herî zor ya sirudan de Zêwermijara azadî û azadbûn mîna buhayekemezin ya miroiyî mêze dike û bi zarok û xwendekaran dibêje bavû kalê me bi azadî û serbstîjîyane:

Ecdadman şêrî zeman

Huri bûn û serbestî cîhan

(Dîwanî Zêwer, r.178)

Kar ûpêkol û xebat mîna erkekîolî û nîşitimanî mêze dike, herwiha can feda kirin ji bowelat li ba wîgelekpîroze, ew dixwaze zarokên kurd lipaşerojê de bibin mervekî dilsozû karker û bi rumet, herwihadibêje hege em nexebitîn û kar nekîn bawerî ya me bi nîşitman lawazeçunkuxweşewîstî ya nîşitimanê beşeke ji bawerê:

Ême ke mindal û newciwanîn

Hemû bequrbanî kurdistanîn

Çunike hubibî weten le îmane

Be mehebibete sahêb îmanîn

Saey refiqan lerê wetenda

Zor tê nekoşîn zor bê wîcdanîn...

(Dîwanî Zêwer, r.176)

#### 4.1.5. Forma Helbestên Wî

Beşeke zor ji helbestên navdîwana Zêwerî ewên ku ji bozarokan hatîne nivîsîn, mîna helbestên dî yên wî bi kêş û 'erûzî' erebî hatîne nivîsîn, beşeke kemjî bi kêşa xomalîpence hatîne nivîsîn. Hemû helbestên wî ya zarokanî di êk asta hunerî de nîne, bi taybet ew sirudên ku ji bodibistanan hatîne nivîsîn bi meramagotin ji cem zarokan de, çunike sirudên wî herçnde le asta naverokve ji bocivatê wê serdemêgelekîgirîngûpêwîst, lê li biwarê form û ziman û statîk de, astê sirûdan nzimtire li helbestên dî, zêdetirjî sirudên wî ew qasî mîna nezim xûya dibin, weke helbest nayên derketin, Hisên Befrîn dibêje: "Beşek ji sirûdan

helbest nîne dikarîn li ser weznê mî'r bê nê hesbandin lewma tu sîfateke helbest têda nîne û tenêgotinê normalin û bi qafiye hatîne nivîsîn, çunku di dema xwe de li ser daxaziya mamostayên dersaolî, cugrafîya, jimariyarî û dîrok .....hud hatîne danan".<sup>93</sup>

Libiwarê kurtî û drêjî de, hemû tekestên Zêwer ku dikevin navedebê zarokan bi qasî hevdû nîne, hinek ji wangelek kurtin digel hez û şîyanê zarokan li hevhatîne, hita helbestêwihajî hene tenê li 3 malîkan têpêk hatin, li beranberjî de tekestêwihajî hene nêzîkî 40 malîk dibe.

Sebaret bipeyvên biyanî di tekestên wî de, sirud kêmtirpeyvê biyanî têda hene berawird bi helbetsên dî, herwiha li helbestên cot qafiye de bêtir zimanê kurdî bi kar aniye, mamoste Marif Xeznedar ewepîştirast dike û dibêje: "Li helbestên mîletkî û bi taybet cot qafiye de zêdetirpeyvê kurdî ya zelal bi kar aniye",<sup>94</sup> digel vê çendê jî peyvên mîna weten, ecdad, 'îlm, fezil, cewher, ceninet, 'esir, 'alem, hîrs, meyûs, sen'et, ze'amet, 'alî, nî'met.. kû 'erebîne hatîne bi kar anîn, bêguman ewejî bovê qonax û serdemêgelekî normal bûye.

Zêwerê mamoste û helbestvan û rewşenbîr û hişvekrî, li helbestên xwe de mîna ji bohemûçîn û tujek nivîsiye, herwiha zarok û xwendekarî dibistanan jî ji bîr nekriye mîna D.Marîf Xeznedar dibêje: "Her kurdek li herpleya xwendewarî li her astekî darayî be li berhem û helbestê Zêwer de beşê xwe werdigre, li zarokê dibistanêve heyapîrekî rewşenbîr û xundevan".<sup>95</sup> Li navzarokanjî de, helbest bozarokê biçûk û meztirjî nivîsandine, herwiha çewa ji bozarokê kur nivîsandiye, wihajî zaroka keçjî ji bîr nekriye.

Ew li destpêka sedisala 20 an de dest bi nivîsîna helbest û sirûdan ji bozarokan kriye, yekem helbestvanê kurde li başûrê kurdistanê û bi zaravayê soranîpîştî helbestên fêrkarî yê Şêx Marîf Nodî bi navê Ehmedî, li ser destê Zêwer bingeha helbesta zarokên kurdî hatiye danan bi rê û rêbazeke hunerî.

Her rexinekî hege li biwarê perwerdeyî û zarokinasîve derbarê helbestên wî bêgotin, berî her tşîtî dibe biçav, vê serdemê û bi mîzan û muqayesa hingî bê hilsengandin û rewşa rewşenbîrî û wêjeyî yavê serdemê kurdistanê û navçeyê bi tevayî bê li berçavgirtin. Ewe jî zelale ku Zêwer herçend bêje û têgehî farsî û 'erebî di helbest û berhemên wî de hene, lê di navhelbestvanên hevçerxêwe de ji aliyê bi kar anîna zmênde, zimanê xwerû û sade temsîl dike.

## 4.2. Goran (1904-1962)

### 4.2.1. Jiyana Wî

'Ebidulla begê kurêSlêman begkurê'Ebidulla begberinyas bi Goran li sala 1904 an de li bajêrêHelebice li başûrê kurdistanê ji dayk bûye, piştî sala 1937 an weke mamoste li Helebice û derdorî wê dest bi kar kriye, piştira karî dyê mîrî kriye. Herwiha di navbera salên 1942-1944 an de li radîoya rojhilatê nêz de li yafa ya filestîn kar kriye, di navbera salên 1952-1954 an de li rojnameyajîn kar kriye, çend carek ketîte hepsxanan û li sala 1962 an de li slêmanî koça dawî kriye.<sup>96</sup> Ew ji bilî ewe ku bi êk ji pêşengê herî navdar ya nûkrna helbesta kurdî li sedisala 20an de tê hesbandin, herwiha cihê destê wî xuyaye lipêşxistina edebê zarokên kurd de, renegepîşeya mamostatî û kar kirina wî mîna rojnamevan li rojnameyajîn û li êzgeya rojhilata nêz de li yafaya filestîn... alîkar bûne hita Goran li edebê zarokan nêzîk bikeve.

### 4.2.2. Goran û Helbest

Goran lijiyêgelek zû de dest bi helbest nivîsîn kriye, lê "Li sala 1929 an de li meşqê helbest nivîsînê li ser lingwestaye, herwiha ew êk ji wane ku rolekegirîngdîtine ji zelal kirina tekestên edebî li zimanê kurdî de, herwihapeyvê xwerû û hêsan û hevoka kurt bi kar aniye. Evkarejî tenê zimanê edebî dewlemend nekriye lê belê bi kêr zimanê standardê kurdîjî hatiye".<sup>97</sup> Herwiha ew êk ji wan helbestvanane ku "Rolekegirîngdîtine li anîna hinek babet û mijarên nû li edebê ewrupîve bonavhelbesta kurdî, ku hinek ji wan mijaran lipêş de li edebê kurdîda tu nebun, mînaopêrêt ûpiyes û satîr ûgalteugepû komîdiya ya komelayetî û metelok û sirûdê nîşitmanî û helbesta zarokan û ya dîjî".<sup>98</sup>

Goran ku bi nûkerê helbesta kurdî tê danan, livê helbestên ku bomezinanîjî nivîsandine xwendinewe û fêm kirin bozarokan negiranin, herwiha ew helbesên taybet ji bozarokanî nivîsandiye, tam û bandora bomezinanîjî hene, bi kurtî "Ew helbestên ku bomezinan nivîsandine zarokîjê fêm dikin, ew helbestên ji bomezinanîjî hatîne nivîsîn zarok hezjêdikin û fêm dikin, bi kurtî ew herdû ziman zaniye, zimanêmezinan û zimanê biçûkan".<sup>99</sup> Bonimûne ku dibêje:

Tê xure, tê xure

Mê têr ûgwanpre

Demî ran mol dane,

Ta bilê deşit ciwane

(Dîwanî Goran, r.52)

Li helbesta bo bilbil de dibêje:

Eybaldarî êsk sûk,

Bilbilî denûk bçûk,

Baxçe be baxçe efrî,

Wçanêkî lê egrî

(Dîwanî Goran, r.103)

Weke tê dîtin ew helbest hita asteke zor li cîhan û sirşitê zarokanve nêzîkin û beşê zêdetirîpeyvê bi kar hatî heger ser bi ferhenga zarokanjî nebin, bi sedema hêsanî û zelalî zarokjê fêm dikin, îca ev ji bohelbestên leseremergî hîwa û her dû hawînegeşit û beşeke zehifoperêt û helbestê dî her raste, lewma raste li cihêxwe de ji bomezînan hatîne nivîsîn û ser bi edebê zarokan nîne, lê beşa zarokanjî têdane.

#### 4.2.3. Geşitek Bi NavHeşit Helbestê Goran De

Ew helbestên Goran ku li rêzê helbesta zarokan tînan hesbandin, jimareya wangelek kêmin, lewma ew tenê 8 helbest li beşê zarokan li dîwanê wî de hene, kupêk tînan ji helbestên saway aşitîxwaz, cegertanîn, goranî kew, berxekem, goranî denikegenim, pişîlekem, kerwêşk û befir, ku li navwan de helbestên cigertanîn, berxekem, kerwêşk û befir kurtin û jimareya malîkê wan kême, ewejî ji bozarok li hevhatî û hêsane, herwiha livê heşit helbestê de, helbestek li ser kêşê 5 kîteyî û sê helbestjî li ser kêşê 7 kîteyî û dû helbestjî li ser kêşê 8 kîteyî û êk helbestjî li ser kêşê 12 kîteyî û helbestekjî wek tekesteka azad hatiye nivîsîn.

Goran li helbesta saway aşitîxwaz de, li serî zimanê zarokve behisê aşitîxazî dîke û dxwaze kevukê sipî, ku nîşaneyê aşitê ye li destêçeçel turgrizgar bike, di heman demê de naxwazegurmeya bembayan û agirê şer mala aşitî û tenahî xerab bike û ku bi sedema wê babê wî bê kar dibe û diya wîjîçavbi hêstir, herwihadibêje meric be heya ezê bijîm dibe bi zimaneke bilind û zelal stiran ji aşitî û tenahiyê ra bêjim :

Minalêkm korpey naz

Wek bawkî xom aşitîxwaz

Kotirî sipîyi teqlebaz

Leçeşel ekem derbaz

Minalêkm, minalêkm, aşitîxwaz

×××

Namewêgrmey bomba

Be kutek le kellem ba

Namewêşepokî şeri

Malî bawkm ba be ba

Minalêkm, minalêkm, aşitîxwaz

×××

Bawkm nabê bêkar bê

Riût ûqût ûhejar bê

Daykm firmêskî xemî

wek dilopî behar bê

Minalêkm, minalêkm, aşitîxwaz

×××

Namewê hetiyu kewm

Kelawe bê cêf xewm

Leberewe mayey şeri

Kê bê dujminî ewm

Minalêkm, minalêkm, aşitîxwaz

×××

Emca merce ta mawm

Be zimanêparawm

Goraniyî aşitî bilêm

Aşitîyi riûnakîçawm

Minalêkm, minalêkm, aşitîxwaz

(Dîwanî Goran, r.421 -422)

Herwiha li tekesta cigertanîn ku li ser zimanê zarokê sava hatiye nivîsîn, bi dê û bavû mezinan radigehîne ku zarok, dil û kezeba we ne, runahiyaçavan û hêzapaşerojêwelatê n, lewra dixwaze sîlahê şeri neyê bi kar anîn :

Cigertanîn, sawatanîn,

Gulî baxçey hiywatanîn

Bizey naw bêşkeyn bodaykan

Rûnakîyiçawîn bobawkan,

Hêzî dwarejî însanîn

Be kelik ebîn herwek ciwanîn

Mawe meden şeytanî şeri,

Dezgay kîney bixategeri

Beçexmaxey tîşkî etom

Êsqanmantan bobika be mom!

Mawe meden bêşkey minal

Gir tê berbê wek koî zuxal



Mawe meden ruwî eriz hemû

Bête hêlaney bê bêçû.!.

(Dîwanî Goran, r.423)

Goran dizane ku zarok dostê candarane û hez bi dîtîne wan dîkin, li navcandaranjê berxik ku hem candareke kevî û hemjî xweşik û nazîke, lewra li helbesta berxekem de, li ser zimanê zarokanvegazî berxikêdike:

Eyberxoleke!

Nerm u noleke

Sipîû xirpnî,

Wek kuluwî loke!

×××

Destemouçesî,

Fêre baweşî,

Dengî bare xweş,

Ciwanûçawreşî!

×××

Boher kwêyekçûm,

Toîş were le dum,

Etlewerênem,

Herweku bêçûm..

×××

Were xle - xl!

Bçonerm ûş!

Bibarêne: ba.!

Berxîçaw bi kl!.

(Dîwanî Goran, r.426)

Li helbesta goranî kew jî de ku kêşa xomalî ya heft kîteyî bi kar aniye, li ser zimanê kew kebik û bi qeqbe qeqbe wesfê rê û cih û hêlînêxwedike û behisê ew şax û şkeft û derdore dike ku têda dijî:

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

Şaxî beriz û berdî req

Cêgayçêlew cêgay beq

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

×××

Befrî tazew befrîpar,

Nabrê le lûtkew nzar:

Nepayzu ne behar,

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

×××

Ber beroçkey eşkewtm,

Zistan cêgay sirewtm,

Melbendîçînew rewtm,

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

×××

Raeperim berbeyan,

Helekşêm bolûtkeyciwan,

Exwênem riû le asman:

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

xxx

Mangî hezar be hezar,

Be yekgvey berew xwar

Ebrim le tirsî zordar

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

xxx

"Fcûq..." le daliçawzeq,

"Qx..." le rawkerî dilreq,

Le tifengû teqe teq..

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

xxx

Gişt êwarewgişt şebeq,

Şaxpri ekeynçêl ubeq,

Le cirîke.. cirî.. teq, teq, teq,

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq!

(Dîwanî Goran, r.421)

Herwiha helbesta goranî denikegenimjî, ku yekem helbesta azad ya zarokaniye, helbesteke drêje, ligorî navnişanjî helbest li ser zimanê hebekgenimî hatiye nivîsîn, lê li dîmahîy her koplekî de hevuka denikegenimim... dûbare dibe. Herçend ligorî hinek te'bîrê navhelbestê mîna derkî 'emar eşkêni), (toum weşandpir bedil, êsta wşke, bêgiyane.. û ebê be qersîlî şîn.. wiha xûya dibe ku helebst li ser zimanê cotkarî hatiyegotin :

Nawî Xway lê ehên

Derkî 'emar eşkên

Be barginim derdên

Lenaw werda eyçên

Wek altun zerde

Pak û bêgerde

Denikegenimim...

(Dîwanî Goran, r.427- 429)

Ewe hebegenimpir bi dil ji aliyê cotkarve hatiyeçandin, lewma dixwaze kuçvîk û mşîk û kurim nexon,

Poleçolekey serçl!

Mişkî naw kun! krmîgl!

Wirde melî sirk ûsl!

Toum weşandpri be dil!

Eygrê xwa

Her kesê bîxwa:

Denikegenimim...

(Dîwanî Goran, r.427- 429)

Pîştira dibêje rasteniha hişk û bê cane, lêçend rojeke dî dibe sîhrîjînê, wihamezindibe ku bi zehmet tê bawr kirin:

Êsta wşke, bêgiyane

Em denikegenime ciwane..

Dû rojî tir brwane..

Telîsmêkîjiyane..

Xwa efermwê

Ewîş eriwê:

Denikegenimim..

×××

Ebê be qersîlî şîn..

Beriz ebêteweçîn-çîn..

Dîmenêkîçend şîrîn

Ebexşê be serizemîn..

Xwa daygiyanî

Xwa nexşanî

Denikegenimim..

×××

Gawgwêrekey serero

Ajalî ziyane xiro

Berazî şexelî ko

Dujmin neyxwagenim ûco

Nefrînî xwa

Leweybîxwa:

Denikegenimim..

×××

Beharê qef dereka..

Gul heta ber singsereka..

Drikpasî ber eka..

Be şney ba

Şepol eda:

Denikegenimim..

xxx

Ey xwaygerdûne berize!

Dexlekem bparêze

Le sin ûkulle ûterize

Eygerdûne bilinde.!

Hîyi toyê umin

Nek hîyi dujmin

Denikegenimim..

(Dîwanî Goran, r.427- 429)

Piştira li mehî cozeran û mewşîmê drune de, mîna zêri zer dibe, bi hêvya ewey her lubek ji gulegenimê bibe hizar heb:

Dexlim wek altûn zedre..

Werizêr! das le hesan de!

Xot asayî tekan de..

Melom bole xerman de..

Xermanî sûr

Wek kogay nûr

Denikegenimim

×××

Her denike bû be hezar

Sipas botokrdgar!

Beşî tou beşî 'emar..

Beşî deskurt ûhejar..

Hate berhem

Sipas ekem..

Denikegenimim..

(Dîwanî Goran, r.427- 429)

Bêguman li helbesta Goranî denikegenimçîrokaçandin ûpêgihîştin û druneya hebegenim, kugenim bi xwe wata nan nanjî sîmbulê rizq û rozî û qûtajîyanê ye, tekesta goranî denikegenim helbesteke hînikariye ji bozarokan, li nehpêngavan de serbrdeya hilgrtin ûçandin û drûnewe behisdike "mîna waneyeke kiştukalîpêşkêş bi zarokan dîke".<sup>100</sup>

Helbesta kerwêşikjî êkeke li helbestên kurt yê Goran e, ew li helbestê de wêneya kêviruşîkek dkşîne, ku li navhêlîna xwe degohî xwe li serpişt danave û dixaze razê, livê demê de nêçîrvanek bi dûde diçe, kêviruşîkjî radîbe:

Kerwêşk lenaw lana

Gwêî leserpişt dana

Çawî nûqandprxe-prx

Nûst ta rawker wtî :px!

Emca herdûgoêî leqan

Şanîpyakrd be bazdan

Kerwêşke nêzîke dujmin

Kerwêşk rake qunequn..

(Dîwanî Goran, r.432)

Li herçar mînakê helbesta kerwêşik de, Goran gelek bi westatî, bipeyvan dîmena candarek dikşîne ku kêviruşike, herwiha wêneyagoh li serpişt danan ûçavgrtin û derbas bûnê bi huner nîşan dide.

Êkek dî li helbestên Goran, helbesta befire, ku li ser zimanê zarokekîve bi babêxwedibêjertikprtika berf ya sipî û xweşik navhewş tijî kriye, piştira li wesfekegelek hunerî û qeşengde, glmta berf biperî û balêsipîyê ya de'byan ûperêplîstanikan dşbihîne. Herçnde helbesta befir li ser kêşa 11 kîteyî hatîne darşitin, ku xûyaye evkêş ji bozarokangirane, lêpeyvû hevuk û wêneyên navhelbestêpir hunerî û nazkin.

Aybabegiyan! befir ebarê, temaşa:

Cêga nemapêyek danêy le hewşa

Kilû kilû dête xwarê: sipî ûciwan

Denike denikeş ba eyhênê boheywan

Elêy wirdeperîsipî de'baye

Ya lêşawîpepûley naw hewaye

Eha babe! ew rîşole hejare

Kiz kiz nîşitotewe lew binpasare

Êsta mşitêgenim dên m roî ekem

Ba bê bîxwaw necatî bê le matem

(Dîwanî Goran, r.433)

Goran li helbesta pişîlekem jî de, bi curek wesfapisîkêdike ûpeyvê nerim û nazikî borêz dike, mîna wesfê korpekîçavgeş yaxwe bike, yagazî zarokekîpakijû ciwan bike, herçnde helbesta pişîlekem tekestekegelek drêje, lê li wesf ûpeyvû wêneyê nazik de, dewlemende bipeyvan ûçêjû bandorêvê helebstêgelek zorin:



Miyaw, miyaw.. miyaw, miyaw.. wîrd wîrd rake,

Pîşe xîrpney dem ûlûtpake!

Kluwe awrîşmîgiyandarm,

Çawpîroze, klk kule marm!

Rake,rake, were baweşm,

Lamil helsû têr le leşm!

Kilkî tîskin lûl kew repke,

Nermey destmgalte- qepke.

Nînokî tîjderperêne,

Qey naka! brine, bidrêne:

Dest ûdem ûçawu clm

Pîşe, herdû dest bikere milm!

Mûy smêlî şaş, lûtî sûr

Bigre boma maçênî dûr!

Ke manû buwî le destibazî,

Pîşe, rahatuwî koşî nazî.

Xotpepke de Leser ranm,

Bepxepx, pşekewciwanm,

Lêk nêçawî meyle ûşînt,

Wirde cûley xew bînînt,

Egerçî rameçlekênê,

Belam nexte nexte dênê

Pirxepxî yek ahengt,  
 Şêwey k ûmat ûmengt,  
 Boçawî minîş wenewzêk,  
 Çaw lêk enêm minîş tozêk

(Dîwanî Goran, r.430-431)

Goran li hemû helbestan de ku taybetin bi zarokan û ji hevcuda li helbestvanên berêxwe û hevçerxêxwe kuji bozarokaniyan nivîsandiye, heya astêkî mezinxwe biçûk kriye boastê zarokan, li demekî de astê hunerîya helbestan hêj bilind û watadar û bi hêzn, Hisên Befrîn dibêje: "Li tewawê wê helbestê de Goran nehatiye mîna kesekî mezin û dinyadîde û haydar û têgeyşitî li zarokan mêze bike lê belê ew xwe biçûk kriye ji boastê zarok û mîna Goranekî zarok derbarê tşitan dpeyve, ewe jî boyekem caran Goran aniye navçihana helbestî zarokan û tédajî serket ".<sup>101</sup>

#### 4.2.4. Goran û Metelok

Jibilî heşit helbestên zarokaniyê Goran ku hatin behis kirin, herwiha Goranê helbestvan, beşekî zur metelok bi rêzika helbestan nivîsandine di dema xwe de li rojnameyajîn de hatîne belavkirin, jimareya metelokan 53 hebin, xûyaye "Helhênan û metelok jî girîngiyekemezin hene ji bozarokan... çîrok û metelok wa li zarok dikin bi zîrekî li diyarde û tiştên jiyan fêmbikin û lipeywendiya navbera tşitan fêmbikin. lewma bi kar anîn û fêmbikîna metelokan li hest û nestê zarokan nêzîke",<sup>102</sup> çawa kesê mezin jî mêşkêxwe bi metelokan dixwînin û zaxaw didin, herwiha zarok jî mifajê werdgrin :

Marî drêju barîk

Serî le kunî tarîk

Derehêne ûbe ziman

Hêl exate ruwî meydan

Ruwî meydanî befrîne

Hêl yan sûre, yan şîne!

Her hêlê temaşa key

Çîyi kêlabêt têî egey!

Em marî skpri awe

Ax etzanîçîyi nawe!

(Dîwanî Goran,r.517)

Herwiha li êk li metelokên dî de,bi rêzikeke hûr û komedî behis dika, tenanet metelok bi gohdrêj î dişbîne, çunku mase jî li serçar lîngan disekine:

Wek ker leserçwarpê westaw,

Heyetî riû, heyetîçaw!

Piştîpanew barî sûke,

De'bayekî leş bê tûke!

Çî bê nawî em de'baye

Ke nzîkî kursîyi şaye!

(Dîwanî Goran, r.519-520)

Li metokê hijimare 21jî de, behisê ewe dike ku metelok ji pênc tîpan tîpêk hatin, ku tîpê yekem û duyem xire, watego, ya dibêje lipîtî duweyem heyapêncpşuwîpîştî kare, wate uçan/ betlane, herwihadibêje hege tîpê sêyem nebe, şîrîjê dikîn mencelê ku mebestê wîgiwan/guhan e:

Pêncejimareypîtgelî metel

Bê sê şîrekey ekene mencel

Yek û dû xire ûyek ûdwan ûsê

Be şîş ebrjê û eyxwagşit kesê

le dû hetapêncpşuwîpaş kare

Sê ûçwar legel dû ebînê diyare!

Ewende sûk asane metel

Yarîyipêeka şwanî lay ajal

(Dîwanî Goran, r.523-524)

Evmetelokên me bi mînak anî û yên dîjî, herçend li riwalet de heya astekgiran tîn derketin, lê bi xwendin û mêze kirin xuya dibe ku ji bilîvêçendê ku zarok han dide bi dû zanist û zaniyarîyan de biçe herwihawiha li xwendevan bigelemperî û de zarok jîdike haydarî kod û lîstikan bibe û şarezayyapeyvû hemwatayê kurdî bibe. Bi kurtî hege di dema xweji de metelok ji bozarokan nehatibin nivîsandin an li rêzê berhemên zarokanî Goran nehatibin danan, lê tu caran livê heqîqetê kê mabe ku metelokçende ser bi edebêgiştî û mezinanin, ew qas jî -bgre zêdetirjî- ser bi edebê zarokanin.

#### 4.2.5. Sirûdên Goran

Bêguman li destpêka sedisala burî de bi taybetîpiştî salê (1920)an li başûrê kurdistanê de, beşek li helbestvananê vê serdemêçend tekestê helbestan bozarokan û xwendekarêdibistanan nivîsandine, de ku awaz bobête danan û bi rêzikê sirûd bêngotin, ya beşek livan helbestan berî ewey ku bîn nivîsîn, awaz ji bohatîte amade kirin, anku li ser awazêhinek sirûdêtirikî, 'erebî û farsî hatîne danan, wate "Di destpêk de di dibistanan ji aliyê xwendekar û zarokan bêngotin".<sup>103</sup>

Hemû ewên rolekemezin dîtine li nivîsîna tekestê taybet ji bosirûdan an sirûdên bêrikirinê, dikarin li rêzêpêşî de navê Zêwer, Pîremêrd, Dildar, Bêkes.. bêgotin ûpiştî wanji her êk ji Kakey Fellah, Şewnim û Medhet Bêxew... ewgelek sirud danayne, li navwanji de Goranê helbestvan, hinek helbesta nîşitimanî û neteweyî danaye, ku digel zarokan, mezinjîgohêxwe lêgrtîne û ji cem wanjîve hatîtegotin, çende bi berhemê zarokan hatîne hesbandin, wihajî beşa mezinanji têda bûye, çende ser bi edebêgiştî û mezinanin, zêdetirjî ser bi ferhenga zarokanin û diçene navxaneya edebê zarokan û dîrokêedebê zarokan.

Jimareya tekestên Goran ku li beşa sirûd de li dîwanê wî de hatîne hesbandin, 11 tekestin bi navnîşanên kurdistan, berî beyane, demî raperîne, newroz ekem, ey lawî kurd, goranî qutabiyar, cejnepîrozey aşitîxwazan, çwardey temûz, marşî aşitîxwaz, yadî lenîn û cejnî eyar, ku li navwan de herdû tekestê newroz ekem û marşî aşitîxwazgelek drêjn.

Di navvêl1 tekestê de, tenê tekestên kurdistan, berî beyane, neroz ekem û demî raperîne zêdetir mîna sirûd hatîne bi navkirin û weke sirudên naskrî û navdar xûya dibin, herdû tekestê saway aşitîxwaz û cegertanînjî herçende li komeleya helbest bozarokan li Dîwanî Goran hatîne danan lê bi qasî ji bosirûd dişên û li hev n, ew qasjî li şeş helbestê dî yên wî ji hevcuda ne.

Ew li helbesta kurdistan de, wiha wesfêxweşikiya ya kurdistanêdike :

Kurdistan.. kurdistan!

Nîşitmanî ciwan!

Her bjî be şadî..

Serbestî û azadî..

Her bjî! her bjî! her bjî!

(Dîwanî Goran, r.523-524)

Li tekestê newroz ekemjî de, dibêje newroz ji bilî me, cejna kenîna siriştejî, cejnekegelemperî ye, rojavejîne gele, cejn û rojavejînegul û geya û daran e:

Newrozêkî besoz ekem,

Cejnîgelîpîroz ekem:

Ahengî newroz toz ekem!

Newroz ekem! newroz ekem!

×××

Newrozî min beharîye,

Zerdexeneyruwî siruşite,

Le deşitî rengîn diyarîye,

Her hîyi min na, cejnîgşite:

Rojjîyaneweygele,

Hîgij ûgiyaye hî mele..!.

(Dîwanî Goran, r.523-524)

Li sirûdêgoranî qutabîyan de, bangewaz dike ku ba her kespişt bi hevdû bibestîn û bangê aşitî li seraniserê cîhanê bidîn, bi xwendekaran dibêje şer dikeyn de ku şer nemîne, de ku hemû cîhan azad be:

Eyqutabîyi wlatangşit,

Be yektirî bibestinpîşt!

Be yekiyetî wrd ûdrşit

Heqî aşitî exeyne mşit!.

×××

Bombayetom naytirsênê

Hêzî lawan xoî binwênê,

Raestawîn wekpalewan

Ecengîn ta şeri namênê,

Ta meşxelîyi azadîgşit

Gri legşit la helesênê!.

(Dîwanî Goran, r.411)

Jibilî ew tekstên behis krî, dû tekestê dî li navdîwana Goran de nîne û herdû tekest ji bodû munasebe û buyerî siyasî hatîne danan, yekem tekest ewe ku dema xwe Goran li helebice nivîsandiye û biçend zarokek ezber kriye, heya li demapêşwazî kirin li melîk Feyselê Yekem bohelebice bêngotin.<sup>104</sup> Duwemjî tekestekî ku bi sedema brîndar bûna 'Ebidulkerîm Qasim hatiye nivîsîn û weke sirûd le dema xwe de hatînegotin,<sup>105</sup> lê herdû sirûdçunku ji bodû buyerî siyasîyi bûn, zwî mirin û bivê sedemê li dîwanê wî de nehatîneçapkirin.

HerwihaGoran helbesteke dîjî drêjî heye bi navnîşanê kurdistan, vê helbestey ku bi kurdistan: cêgamî, cêî hezar salem /perwerdey ewdol ûser lutke ûyalem! destpêdike, herçnde li beşî sirûd li dîwanê wî de nehatîne danan lê beşekî helbestê wek sirud hatiye gotin û ji aliyê Elbêrt 'Îsa awaz ji bohatîne danan.<sup>106</sup>Naverokê sirudênGoran, bigelemperî mijarî neteweyî û hinek munasebeynîşitimanî û behisa azadî û aşitî û kar û serhildan û jiyânî dûr li şeri û nefret kirin li agr û bembane. li navwanjî de bîr û bawerê siyasî yêGoran li sirûdan de bi aşkera xûya dibe.

#### 4.2.6. Çend Serincekê Giştî

Goran û helbestên wî yê taybet bi zarokan kupîştî ezimûna Zêwer, Pîremêrd, Dildar, Bêkes... tê ûpraniya wan dikevinpiştî şerê cîhanê yêDuyem, rolagirîngdîtine li zelal kirina zimanêedebê zarokanî kurd, bi kurtî "ew helbestênGoran ku ji bomezinanî danaye zarokjîjê fêm dikin, ewejî ku ji bozarokan nivîsandine mezinjî dxwênin û tamjêdikin, Goran herdû ziman zanîne, zimanêmezinan, zimanê bçûkan".<sup>107</sup>

HerwihaGoran komelek hevuk û nîgara nuwî aniye navhelbestê zarokan, ku helbestvananî dî yê berî wî tşitekî wiha nekrbûn. bonimûneGoran boyekem car hevukên firmêskî xem, goranî aşitî, baxçey hiywa... û wêneya dexlim wek altûn zere, çawî nûqandprxexrx nûst ta rawker wtîpx, klû klû dête xwarêsipî ûciwan/denike denikeş ba eyhênê boheywan û htud...î aniye navhelbestê zarokan, her ewjî boyekem car helbesta azad aniye navedebê zarokên kurdewe.herwiha tu helbestekî zarokanîyGoran li ser kêşa 'eruzê 'erebî nehatiye nivîsîn.

Ligorî her xwendinek ku ji boberhemênGoran hatîne kirin xuya dibe hemûvê helbestên naveroka wan stayş ûpesindana şorişîçardeya tebibaxê 'êraqê û lînîn û moskoû koriya...ne dikevin qonaxa duweyem yajiyana edebê yaGoran, herwiha helbestên zarokanîy wîjî dibin dû beş, bonimûne her êk li helbestêngoranî kew, berxekem, goranî denikegenim, pşîlekem, kerwêşk û befir bi zimaneka hêsan û zelal hatîne nivîsîn heya asteka zor li cîhan û saykolojyayê zarokan nêzîkin û li ser zimanêgul û candaranve dpeyvî.

Lê li helbesta saway aşitîxwaz û cigertanîn de ku helbesta siyasîyi ya zarokanin û zêdetir mîna marş û sirûdan xûya dibin ewejî rengdana barudoxîvê serdemê -destpêkî nîvya duyemî sedisala bîstan -

Goran çewa li helbesta mezinan de, bipêşengû sermeşqa nûkirina helbestê kurdî tê danan, bi heman awayî li helbesta zarokanî depêşengû nuxaze, herçende bijimare helbestê wî kêmin, lê li biwarê form û naverok de ew tşitekî nu aniye navedebê zarokên kurd. ji bervêçendê ew tesîrekgelek mezin li ser yênpîştixwe kirine.

Ew xwe bi dûrgt li hîn kirin û û şîretê rastewrast, lewma hege helbestvanên hingî mîna Zêwer, Bêkes, Cgerxwên, Pîremêrd, Dildar û 'Ebidulwahîd Nûrî... bi zimanê: rolekem binû, hizir û hoşit bê, mektebjîyanî mîllete, dadenîşm bi edeb, xwendin nebî kes naçepêş, bodwarojhewl edeyn, be exlaqî ciwan be 'ilm û 'îrfan, heste dem ûçawt bişo û hud..., Goran tu caran wiha ziman bi kar neaniye.

### 4.3. Letîf Helmet

#### 4.3.1. Jiyana Wî

Letîf kurêMehmûd kurêMihemed Hesên berinyas bi Letîf Helmet li sala 1947 an de li bajêrokêkifrî yê ser biparêzgeha kerkûkê li başûrê kurdistanê ji dayk bûye, her li zarokiyexwe de di navpirtûkxaneyê babêxwe de hînî xwendin û nivîsîn bûye, mîna xwedibêje: "Her ku li dayk bûmgohim li helbest buwe, lewma li malek de mezin bûm tijî bû lipirtûk",<sup>108</sup> serdemapêgehişitîn û destdane nivîsînê li cem Letîf Helmet li demekî daye ku rewşa edebê û rewşenbîrî li kurdistanê başûr û navçeyê de bigelempêrî bi qonaxeke nû derbas dibe.

Ew, yekem helbestêxwe li sala 1963 an de nivîsandiye û li sala 1970 jî de dîwana xwa û şare bçkolekeman çapkriye,<sup>109</sup> her li serdemê xortî de, destek li helbestvanên nûxazî 'êraqîgrupek be navêgrupa helbesta 69 li sala 1969 de li dar dxin, herwiha livê salê dejimarek helbestvan û nivîskarêvê serdemê başûrê kurdistanêjî manîfêstekeedebî ragehand bi navêRiwange, hevdem Letîf Helmet ûjimarek helbestvanê hevalê wî, li sala 1970 an degroupek ragihand bi navêGrupî helbestî kifrî ku Helmettêda roleka berçavdîtiye li nûkrina form û naveroka helbesta kurdî li başûrê kurdistanê, piştra ku beyaninameya yazdey adara li sala 1970 an de hate derkirin ûgotubêja siyasî di navbera hikumeta hingîy 'êraqê û şorişa kurdgehişitine rêkketin, gohrîneke new'î bi ser rewşajiyana siyasî û civakî ya xelikêbaşûrê kurdistan de hat, ewgohrîn bandor li ser zimanênivîsîn û rewşa rewşenbîrî û rojnamevanîjî kir, îdîpiştî hingîLetîf Helmetdigelnivîsîn ji bomezinan li nîvya Duyemî salên heftayan de li sedisala burî de, dest kriye bi nivîsîn û wergeranê helbest ûçîroka ji bozarokan, sebare bi nêzîkbûneweya Helmet li dunyayê zarokan, mîna bi xwedibêje:



"nihajî hest dikem curek li curên zaroktî li navmin de dijî, ji bilî ew helbestên min dxwand, komelek metelok ûgotin û biserhat û beyt û balorey zarokanî hebû ku min li navwan de mezin bûm û bandor le min kir ku bçm ji bonaveçîhanê zarokan...".<sup>110</sup>

#### 4.3.2. Letîf Helmet û Nivîsîn û Wergeran Ji Bo Zarokan

Letîf Helmet yekem helbest ku ji bozarokan nivîsandiye li sala 1975 ane û li rojnameya paşkoî 'êraq de hatîte belavkirin,<sup>111</sup> yekem dîwanaçapkrî yê wîjî ji bozarokan li sala 1979 an de bûye bi navêciwantirîn dê bi watayê xweşiktirîngund, ku lijimarek helbest ûçîrokê zarokan têpêk hatin û li navde tekestîpaçvekirîjî hene. Piştî ewe berhemên dengxweşitirîn mel, hêlaneyekî tir, minal û baran, minal ûçoleke, katjmêr, gulî naw încaneke, pîris le minal, çolekey ser dareke, minal û bûke şuşe, gwêdrêjûpaşa, pişîleyekpaskîl lédexurê, helebice û mangle nêwanî hezar û yek estêreda dexewê. wêbsaytê wêkpîdiya sebarek bi wî nivîsandiye: "Letîf Helmet li sala 1979 an de dest kriye bi nivîsîn li biwarê zarokan de. Yekem ke belavkriye ciwantirîn dê bûye, heya niha 17pirtûk ji bozarokan nivîsandiye. Sala 2006 hemû berhemên wî ku taybetin bi zarokan hatîne kom kirin ku 500 rupelin, herwiha Letîf Helmet xelata Apîkî li ser Dîwanî zarokan wergrtîye, çend caranjî xelatê wezaretîya herêma kurdistanê wergrtîye".<sup>112</sup>

Herwiha sala 2008 an xelata zêrîn ya Biley wergrtîye. Letîf Helmet li biwarê edebê zarokan de ser bi cîlê heftayan ya sedisala buriye û dikeve qonaxêpiştî Goran û Fereydûn 'Elî Emîn û Şewnim û Kakey Fellah, ew ji bilî helbesteçîrokjî ji bozarokan nivîsandiye, lewra dikarîn bêjîn ezimûn ûjiyênivîsînê wî ji bozarokan dinvîse, xebatê wî divêbiwarê de zêdetir li 40 sal dibe. Berî ewejî ku helbest ûçîrok ji bozarokan binvîse li hinek helbestan de ku ji bomezinan hatîne nivîsîn behisa zarokan û zaroktiyaxwedike, bonmune li dîwana gerdelûlî sipî de ku ji helbestêmezinanpêk tê, li helbesta eger de ku li sala 1973an nivîsiye, dibêje:

Eger nexşey hemû cîhan

Têkdenewe

Eger zewî weku loke

Şîkenewe

Ke sinûriyan kêşayewe

Dûbare

Her dêmewe boew şare

Her kurdistan

Dekemewe be nîşitman.<sup>113</sup>

Herwiha li heman dîwan de, di herdû helbestê diwaroj û giyan de ku yekem li sala 1976 an û ya duyemjî li sala 1977 an de hatîne nivîsîn, gelek hêman ûnîgarê navhelbestan te'bîr li zarokîtî dîkin û bi rastewrastjî nebe bi narastewrast bi berhemên zarokîtî tîn hesbandin.

#### 4.3.3. Lîkolînên Li Ser Berhemên Helmet

Jiçil salên burî de hitanihajimareke berçavli lêkolîner û rexinegirên biwarêdebî, li ser berhemên edebî yêLetîf Helmetnivîsandine û li rojname û kovarên kurdî de hatîne belavkirin, li navdejimarek lîkolîn û şîrovekirina berhemên zarokanîy Letîf Helmetin, dijêrîn de beşek livê lêkolînan behis dîkin ku leser berhemê zarokanîy Letîf Helmet hatîne nivîsîn:

Newzad 'Elî Ehmed lipirtûka mindal û edeb kuçapa yekemî li sala 1998 an de hatiye belavkirin, çapa sêyemîn ya elktironîjî li sala 2007 an de hatîte belavkirin, ewpirtûkbehisa ezimûna edebiya hijimarek nivîskarê kurd dîke yê ku ji bozarokan nivîsandiye, li navdeji behisaçend mînakek liçîrok û helbestêLetîf Helmetdîke.

Fazil Mecîd Caf, lipirtûkek de ku bi navê helbesta zarokan li edebê kurdîda ye û li sala 2004 an de hatiyeçapkirin, ewpirtûk di koka xwe de nameye hatiyepêşkêş kirin ûpişkeke ji pêdviyênpila diktoray, livirjî nivîskar beşek li helbestêLetîf Helmet yêperwerdeyî behis kriye.

Pirtûka ruxisar û nawerokîçîrokî mindalan layLetîf Helmet, ku ji aliyê Muzefer Mstefa Îsma'îlve hatiye nivîsîn û li sala 2011 an de hatiyeçapkirin, ewpirtûk di koka xwe de nameye hatiyepêşkêş kirin ûpişkeke ji pêdviyênpila masterî û li sala 2008 an de hatiye nîqaş kirin.Li 208 rupelpêk tê û nivîskar bi tîr û tîjî derbarê ziman, dem, cih û buyer... liçîrokazarokanyêLetîf Helmet diaxfe.

Heme Salih Ferhadîjî li berga yekem yapirtûkek de bi navêpêgey şîrî mindalan lay şa'îranî kurd, ku li sala 2013 an de hatiyeçapkirin û li 340 rupelpêk tê, behisêjimarek helbestvanan dike, ewên ku ji bozarokan nivîsandine, li navdeji 35 rupelêvêpirtûkê hatiye terxan kirin ji boxaftin li helbestên zarokaniyê Letîf Helmet.

Lipirtûkaçîrokî mindalan le edebê kurdîda 1970-1990 de, ku Xalîde Qadir Ferec nivîsandiye û li sala 2013 an de hatiyeçapkirin, li beşekê lêkolînê deçîrokên zarokaniyê Letîf Helmetî hatîte behis kirin, evpirtûk di koka xwe de nameye hatiyepêşkêş kirin ûpşkeke ji pêdviyên pîla masterî û li sala 1999 an de hatiye nîqaş kirin ûpejrandin.

Evçavkaniyên hatin behis kirin û hergotar û şîrove û lîkolînekê dî, li her cihekî me ku zanîbe dibe bi alîkar ji boşîrove kirina helbestên Letîf Helmetî me mifajê wergrtîne.

#### 4.3.4. Naveroka Helbestên Letîf Helmet

Me livir de zêdetir li ser naveroka helbestên Letîf Helmet disekinîn, ewên ku bi xwenivîsandiye û taybetin bi zarokanjî, tenê carina hinekçîrok û helbestên wergerandiyên wî hatîne behis kirin ku me zanîbe dibe alîkar ji boşîrove kirin û fêm kirinaptir lipeyam û naveroika helbestên wî.

Letîf Helmet li hemû ew helbestên ku ji bozarokan nivîsandine lîgelek cih de bi şewazê rastewrast û herwiha narastewrastjî, bi zarokan dibêje ku xweşitirîn cihê ser ruwî 'erdê kurdîstane, dilgîrtirîngundgundê meye, bajêr û şax û bax û kaniyê kurdan ji ya hemu cîhanê rengîntir û xemilîtîre, mîna li helbesta ciwantrîn dê de ku nîqaşek navbera Azad û Peresêlkeçêdibe, Peresêlke bi Azad dibêje ji nivîşkêve zivistan têdê em livirdiçîn, bajêr û cihê dî dbînîn û tu ji min ra were, heta em deryayn bibînîn, kugelek li kaniyê biçûkêgundan xweşiktir û mezintîre, lêAzad bersivê dide ku tu caran ligundêxwe nareve:

Gundekem le hemû cîhan qeşengtîre û kaniye

Biçkolekanîşîyi le hemû deryakanî cîhan mezintîr w

Şox ûşengtîre.<sup>114</sup>

Herwiha li helbesta beçke masî de ewe bigohê zarokan de dide, ku mînaçewa masî bê avnajî, wihajî me li nîşitiman û bajêr ûgund û şaxa kurdan û welatê bab û kalan dîr bikevîn, can dideyn, lewraji wan radibêje werin suz bidîn bi şax û dar û ber û xolê evnîşitiman, em nerevîn û hertim stiranê xweş bêjîn :

Rojê le rojan

Beçke masî yek tora le sîrwan

Le lim ûçewî lêwarekeyda

Grî tînuyetî helîprukan

Mird nîgaygeşî

Helwerî herdûglêneşî

Şare mêrûle berbûne leşî

Minîşçerkeyek le tobitirazêm

Lenaxîgrî awareyîma

Heldekuriûzêm

Derdeçêgiyanm

Emirê goranî xoşî zimanm

Ey nîşitmanm min roley tom û

Hertoî şwên ûcêm

Cêt nahêlm û ciya nabiyewe lêm

Ey nîşitmanm.. şar û şax û dêm..

Heta hetaye her toî şwên û cêm

Leçyakant hîçkat natorêm

HerGoran î xoş

Bodaru berdu lutkey todelêm...

Ey nîşitmanm ey nîşitmanm

Ey şiwên ûcêgay

Hezaran salî

Baw bapîranm..!

Ey nîşitmanim..!

(Dîwanî Mindalan, r.13-14)

Li helbesta minalêkî aware jî de, biserhata zarokek behisdike ku li bajêr û welatêxwe derbider bûye, li ber nale ûgriyan û hêsirêçavan, perî û melayketê esmananjê radibêjin: were bçîn ji bobajêrê dîy xweşik û şîrîn ku tîjî kulîk û hngvîn û stêr û bûkk û şekresêvû hnar û leystukê rengîn û meyweya şîrîne, diçin ji bowelat û bajêrek ku ne cihekî normale, lê belê bihişiteka berfrehe, lê zarokê derbiderprs dike û hawar dike ez li kûme, çma livirm, vir kuderêye û dixaze bzfere bowelat û nîşitimanêxwe.

Minalêkî aware bû le şaran

Hêdegriya ewendey nalan

Dewreyan de melayke ûperî asman

Legel xoyanda brdiyan

Bohezaran şarî ciwanciwan

Bobehêşitî berfrawan

Behêşitîprigul ûhengwîn

Behêşitîpri estêrey şîn

Hezar hezar bûke şûşew

Şekre sêû henarî zêrîniyan dayê

Hezar hezarpfîlkî rengaw reng û

Miywey şîrîniyan dayê

Griya û griyaw frmêskî rişit weku baran

Hawarî krd: êre kwê ye?

Eromewe bonîşitman.!

(Dîwanî Minalan,127)

Letîf Helmet lîgelek li helbestan de, ewe dubarî dîke ku tu cîhek mîna nîşitimanî xwe xweş nîye, le her navçe û derekî bgerî, ewca dzanî kurdistanî zêdî bab û bapîran li her hemû dinêdilgîrtir û xweşewîstire, mîna li helbesta (bestey nîşitman) de dibêje:

Cê niye legşit cîhan

Xoş bê weku nîşitman..!

(Dîwanî Minalan,r.112)

Ew li helbesta (dîcle ûfurat) de, li ser zimanêçom û ruwîbarekanjî, ewe bi zarokan dibêje ku dûr ketin li nîşitiman yanê derd û kul û kovan:

Ke dûr bîn le nîşitman

Demanguşê destîjan

(Dîwanî Minalan,r.115)

Li helbesta (ciwantirîn dê) dejî, biserhata kesekî derbider behisdike, kupîştî ewey li xerîbîy dzvire ji bogundêxwe, zarok û kal û ciwan û mamoste û şvanêgundî li ba wî kom dibin û dibêjinê li bajêrên cîhanêçewajiyana xwe qetand, ewjî li bersivê wanda dibêje nivê cîhanêgeryam, lê li tu cîhekî mînagundêxwedilşa û bextewer nebuwîme:

Wutî niywey cîhangeram

Be froke ûtumbîlpêwam

Le hîçû lat û cêye

Dil xoş nebûm wek ew dêye

(Dîwanî Minalan,r.302)

Bi heman rêzik li helbesta nûsîn de, piştî ewey bi zarokên hevalêxwedibêje binvîsin kurdistan, serketin û newroz, dîsa ewe bigohê wan de didegundê min xweşitirîngundê kurdistanê ye:

Binuse ey hawrêî ciwan

Bepîtî -kaf- destpêdeka kurdistan

Binûse ey hawrêî min

Bepîtî -sîn- destpêdeka serkewtin

Binûse ey hawrêî min

Bepîtî -nun- destpêdeka wşey newroz

Binûse ey hawrêkem

Ciwantirîn dêye dêkem

(Dîwanî Minalan,r.327)

Helmethelbesteke dîjî heye her bi navunîşanê nusîn, livê helbestêjî de li ser zimanê zarokan dibêje binvîsin li ser neynik ûgulêxweşik û li ser diywar û biyaban û darstan...herwihapesinî nîşitiman û avê rwîbarê sîrwan û navê şehîdan û rojaprşngdar dide, heya li malîkê dumahî de ewe radgehîne ku kurdistan xweşiktirîn welate:

Denûsm Leser berdand

Ciwantirîn welate kurdistan

(Dîwanî Minalan,r.341)

Letîf Helmet ji bilî ewey bi zarokan dibêje xweşitirîn cihê cîhanêkurdistane û bçîne her cihekî ji bowelatêxwe dzvirîn, herwihadigel zarokan dibêje me her tşitek hebe dibexşîne nîşitmanêxwe, mîna li helbestapak û xawênî de dibêje:

Herçîm heye..dilm..giyanm

Deybexşme nîşitimanm

(Dîwanî Minalan,r.30)

Herwiha li helbesta pêşwazî zstan de, bi zivistandibêje mînaçewa tohêstir dibexşî bi nîşitiman, mejî awa canêxwe ji bonîşitmanê feda dkîn:

Êmeş hemû weku toîn

Ewîndarî bax ûkoîn

Tofrmêsk û êmegiyan

Debexşîne nîşitman

(Dîwanî Minalan,r.49)

Letîf Helmet stiran bobaran û ruwîbar û cotkar û şvan û krêker...dibêje, lê stiranê herî xweşikê wî, ewên ku li her stiraneka dî xuşektire, ewe ku ji boxweşikiya nîşitman hatîte nivîsîn:

Goranî delêm bobaran

Demam datê awu nan

Li dîmahî ya helbestêjî de dibêje:

Belam kam Goran îm ciwane

bociwanî nîşitmane

(Dîwanî Minalan,r.159)

Nîşitmana Letîf Helmetparçeyên dî yê kurdistanêjî ji xwedigre, mîna li helbesta postî kurdistanda li ser zimanê zarokekîgazndan ji posteçî dike:

Eyposteçî

Eyposteçî

Lekwêwe dêî bokwê deçî

Leberçî namey brakemmm

Bonahênê le qamîşlî..?

Eyposteçî eyposteçî

Tkaye bokwê deçî



Hawar.... friyad

Leberçî namekem nabey

Boxuşkekem le mhabad...?

Eyposteçî...eyposteçî

Haware bokwê deçî

Çend salî tir

Namekey min degeyenî

Be mamm le diyarbekr..?

Haware eyposteçî

Boewende dilreqî

Namey mindalêkî bçûk

Nabey bobawkî le kerkûk..?

(Dîwanî Minalan,r.322)

Li helbesta bal jî de li ser zimanê zarokekî xozî dixaze li slêmanîveçuba ji bonavçeya luristanê û livê derêlîstikdigel zarokê wê derê kiriba.

Ew tenanet livê helbestê ku behisî lîstik û tepapêjî dike, bi zarokan dibêje dema hûn mezin bûn dibin bipêşmerge û zêrevanênîşitimanê, mîna li helbesta topekem de dibêje:

Topekem sirk ûşenge

Pri ligulî rengreng

Li dîmahî ya helbestêjî de dibêje:

Min minalê behêzim

Topî xom deparêzim

Mezinîş bûmpasewanm

## Bogel û nîşitmanm

(Dîwanî Minalan,r.86-87)

Herwiha ligurek helbestên dî yê Letîf Helmetî de, canî xweşwîstina nîşitman û bilind ragrtina navê şehîdan û pesin dana serhildan û stiran ji bohelebice û xweşwîstina zimanê kurdî û cejna newroz û hud... bi zelalî tê dîtin.

Hege helbesta topekem û beşek li helbestên dîy Letîf Helmetî, zêdetir ji bokuran bin û bozarokî kuri hatibingotin, beşî zêdetirjî ji bozarokên keçnivîsandiye, di navhemû helbestên wî de ku xwendevan hest dikedigel zarokî keçdaxfe zêdetir li ser zimanê bukke, lewma aşkeraye zarok û bûkk, bi taybetî zarokê keçû bukkgelek hevalê yek û dûne, hege zarokeka keçbukke nebe mîna eveye ku tu tşit nebe, lewma lsîtka bukk ji bozarokê keç "rehetî didete dilê wan û xem û nexweşîjî ji bîr dîkin û wihadike bawerîy bêtir bi xwe hebe".<sup>115</sup> Îca evrastî ji bohemû zarokeka keçlayqe, bonimûne "zarok lijîy 3 salaçendîn car hej ji ewe dike ku digel bukka xwe razê, piştiragazî bike de ku rabe, lê keçlijîypênc saliyêxwe de hejkirinî zêdetir dîkin".<sup>116</sup> Bonimûne li helbesta bûke şûşe depîştîvêçendî ku behisêpor ûçavû tlî û kenca bukka xwedike,, piştiradibêje wê tu tşitan naxwaze, dxwaze razê:

Bûke şûşekem şenge

Şeri nakat ûbêdenge...

Di benda dawî ji de dibêje:

Şitî ciwanî dedemê

Aw û nanî dedemê

Werî nagrê nayewê

Mandû buwe.. exewê..!

(Dîwanî Minalan,r.31)

Li helbesta bûke şûşekem jî de, behisa ewe dike ku baran bariye bukka wî teri dibe ûpiştira serê wîjan dike û nexweş dibe, lewra dibêjedibe kincî nû ji bowê amade bikm:

Debê dest ûbrd bikem

Clî tazey leberkem

Megrî bûkeşûşegiyan

Wa bot dênm clî ciwan

(Dîwanî Minalan,r.323)

Handanêxwendekaran ji boçûne dibistan û xweşewîstî zanist ûpirtûk û defter û rêzgrtin li mamosteji, rûberoka zêde li helbestên Letîf Helmet degrtîye, mîna li helbestên baxçey fêrge, qutabixane, minalanî baxçe, padaşitî mandûbûn, xew û keleşêr.. dibêje ku dibistan û baxçey zaroyan xweş û dilgîrin, em kelupelên wêderî dparêzîn û rêz li mamoste degrîn, li dibistanê hînî zaniyarî dbîn û mamoste rêberê me ye û bi xwendin serketî dbîn,li helbesta qutabixane de, dibistan bi melbendêhizir û hoş bi navdike:

Qutabixane zor xoşe

Melbendî bîr û hoşe

Eyparêzim baxçekey

Derga û şûşe ûpencerey

Berd nahawm bodarî

Pri legul û henarî...

(Dîwanî Minalan,r.108-109).

Helbestvan canê hevdû qebil kirin û tebahî li cem zarokan xweşewîst dike, herwiha li ser zimanê candar û bê can û zarokanve, behisagirîngî û buhayê azadî dike, mîna li helbestên deng, dartaş, wêney baxçe û balinde... de mîna djminî qefesî xûya dibew ji boazadî distire, li helbesta dartaşji de sund dxwat ku tucaran qefesê nekm:

Ger dartaş bm be mşar

Debrimewe texte dar

Le darîçnar ûgwêz

Drust dekem texte û mêz

Kursî qutabixane û mal

Bogewre û hem bominal

Colanê drustdekem

Bokorpey xende be dem

Belam swênd bê... swêndî beriz

Qet drust nakem qefez

Newek rojê zordarê

Tiya bend bika baldarê..!

(Dîwanî Minalan,r.113)

Letîf Helmet mînagelek kes di helbestvanên dî yn kurd, li ser zimanêgelek ji candarên mîna simore, hrç, se, pisîk, çvîk, kebab, gur, qrk, tutî, rovî, peresêlke, kevuk û kurm û mêrî... helbest nivîsandiye, herwiha li helbestên xwe de zarok bigul û dar ûgeya û keskayî û baxçe û derya û darstan aşna dike. herwek digel ewr û meh û rojû stêr û berf û ba û baran... daxft. bi heman rêzik kolarepişqaqez û bukik û seywan ûpênûs û topû defter... ji bîr naket. ew ji bozarokan behisa nan û aşitî û azadî dike û dibêje sîlah û şeri xerabin.herwiha ji boxizimeta helbest û edeb û zarokan mifa li kelepûr û foliklorê kurdî ya miletên dinjî werdegre. bigirîngî li dersêdibistanê û heja helbest nivîsînê û ngar kşandin ûpêşangehan deaxf.

Herwiha xweşewîstî xwe ji bodaybeb derdbre û wan bi azîz û xemirevên bi navdike, bi taybetîş bi dayk dibêje tu runahiya hemû cîhanê yî û hege tu nebe her tşit tarî ye, bi zarokanjî dibêje ku lazime xwîşk û bra û her endamekê malbatê bi qedr û rêz bin û me hevdû xweş bwe. hanî zarokanjî didet rêz ji bokemendam û xudanpêdawîstiyên taybet hebe, bi zarokan dibêje ew hevalên me kuçavê wan kore, ew bi dil lijîyanê mêze dikin:

Gelê hawrêî nabîna hen

Be dil seyrîjîyan deken

Seyrî reş û sipî deken

Be dil rastî bedî deken

(Dîwanî Minalan,r.320).

Herwiha helbestvanjimarekapir helbestêperwerdeyî û hîn karîjî nivîsandine, ku têda bi zarokan dibêje ba tu rengî nîne, berf li kuderê tê û salçend weriz û her werizekjî ji çend mehanpêk tê, rojên heftîçend rojn û navê wançene, 'adet û etekêtî nan xarin dibêçewa be ûçewapakijî li her derekî bparîzîn.herwiha li rêkajimarek helbestên hînîkarîy de behis li mifa ûgirîngîya şîrê daykî ji bozarokan dike û di heman demê de behisa xerabî û zirarê cigaran dike.

Letîf Helmet liçend tekestekî de, bergrî li kêşeya flstîn dike û bi mezinî navî qudis û beyrut tîne û behisî xirabiya rijêmî îsiraylî dike, bi taybetî li yekem dîwanêxwe de, herwiha ewjimarek helbest ûçîrokê 'erebî wergerandîne ser zimanê kurdî, herwihamifay li naverok û fikrey tekesta edebê ya azerî dîtiye.Ji bilî ewanejî komelek helbestê cîhanî ku ji aliyê zarokanve û ji bozarok hatîne nivîsîn ji 'erebîve wergerandîne boser zimanê kurdî, ku karekî wiha di edebê kurdî de kême hatîne derketin.

Bi mêze kirin li hemû berhemên Letîf Helmetî de ku ji herdû beşê helbest ûpexşanan de xûya dibe ku navbrî tu caran helbestaolî û helbestagaltewgepû metel nenivîsandiye, yanî di dîwana wî de derheqêol ûperwerdeyaolî de helbestpeyda nabin.Çîrokê kurt û drêjî nivîsandiye, lê heya niha tu roman û novlêtek ji bozarokan nenivîsandiye.

#### 4.3.5. Formê Helbestên Letîf Helmet

Ziman di helbestêLetîf Helmet de zimaneka xweru û zelal û nazke, ew kurdîzanekî başe û li kar kirin digelpeyvû hevuk û ngara hunerî û helbestan de renc didet û xwe mandû dike û westatî bi kar tîne, mîna wînekêşekîjîr, bipeyvan ngara helbestî bedewçêdike, li helbesta pêşwazî zstan de dibêje:

Ey zstanî baw baran

Kiçoleyçawprigriyan

Tobe frmêskî rewan

## Gulrêjdekeygişit cihan

(Dîwanî Minalan,r.49)

Raste ber li Letîf Helmet, li edebê kurdî de helbesta azad ji bozarokan hatîne nivîsîn, lê wî zurtirîn helbesta azad ûçîroke helbest ûpexşane helbesta ji bozarokan nivîsandiye, ku beşek ji wangelek drêjn, herwiha livê helbestê jî ku azad nîne û helbestê bi kêş û qafiyene, zêdetirîn li ser kêşê heft kîte û heşit kîteyîpêk tên, lêLetîf Helmet bi sedemavêçendê kugelek helbestê azad nivîsandine, li helbesta mezinanî de ya azad dinvîse, herwiha ji bozarokanî ji bilî helbestançîrokî dvîse, lewra livê helbestên ku bi kêş û qafiyenejî hinek caran bi tamamîgoh bijimareya kîteyan nedaye, bonimûnegelek caran di helbestekî de di bendekî de bi heft kîteyî nivîsandiye, lê di benda dawî dibe bi heşit kîte, helbestêwihajî hene bi tamamî li heşit kîteyan hatînepêk hatin lê li nîvmalîkê dîmahî de dibe neh kîte, bonimûne li helbesta xewn de dibêje:

Min xewnêkî xoşm dî

Manghatibû boser zewî

Le şewî engusteçawa

Meley ekrd le awa

Bedrêjayî şew ta beyan

Meangî dem bexendew ciwan

Legel sedan masî wrd

Her yarî û meley dekrd

(Dîwanî Minalan,r.191)

Wek xûyaye evhelbest heft kîteyî û heşit kîteyî û neh kîteyîjî têda hene. li helbesta zistan jî de, jimareya kîteyan di her nîvmalîkekî wek hevîne, dibêje:

Katê min dêm befr dê

Sipî debê şar û dê

Minal bokolan radeken

Şêre befrîney tiya deken...

(Dîwanî Minalan,r.220)

Herwiha li helbesta asman jî de kupaçvekrîye û wiha destpêdike:

Asman heta bilêî berize

Zistan her baranew terize

(Dîwanî Minalan,r.169)

Ku bi kêşê heşit kîteyî hatiye nivîsîn, lê li nîva helbestê de dibe heft kîte:

Hengaw boher kwêm debat

Asman seyrm dike

(Dîwanî Minalan,r.169)

Tenanet li nîva malîkê dîmahî de dibe şeş kîte û dibêje:

Mangû estêre û hetaw

Boasman bûn beçaw

(Dîwanî Minalan,r.169)

Hem kêş û hem qafiyêjî li ba zarokangelekîgirînge û zurbey tekstên foliklorîjî ku ji ba zarokan xweşewîstin, girîngîyeka mezin bi kêş û qafiye hatiye dan, Letîf Helmet bi êk ji wan helbestvanan tê hesbandin kugirîngîyeka mezin bi qafiye daye, li helbeste azad ûçîrokehelbestanjî de, ku kêş tê feramoş kirin, lê ew bi berdewamî êkêtiya qafiyeparastiye, ewejî bi xaleka bi hêz yê helbestvanî tê hesbandin û mîna 'ezîzgerdî dibêje: "Serwa qafiye diyardeyeka zeqî helbesta cîhanîye bigelemperî û helbesta kurdîye bi taybetî, helbesta kurdî her li destpêkve heya salên bîstan di sedisala bîstem de, bi herdû curênivîsî û zargotin, bi her zaravekî be, gelekpebest(pebend)î qafiye bûye, hege destberdarî kêşî êk rengîş bûbe mîna hinek beytê foliklorî lê tu caran destberdarî serwa nebûye".<sup>117</sup> Digel ewejî liçend cihekî kêş de qafiyeya helebstên Helmet lawaz û dûbare

têda hene,an hinek qafiye ûpaş qafiyeywihay bi kar aniye rîtm û awazî helbestanî lengû nexweş kriye, bonimûne li helbesta kelekêwî de, ku mîna xwedibêje bîroke û bingehê helbestê li tekestekî azerîyive hatîte standin, dibêje:

Lepri şaxî kelekêwî

Gîr bû li şurey telezî

(Dîwanî Minalan,r.256)

Livir de xûyaye ji bopeyvî kelekêwî ku hawqafiyey rêwî, pşêwî, bzêwî, bedinêwî... ye, ew hatîye telezî hlbjartîye! herwiha li beşekî dîy helbestan de ji bopeyvêbiderê, peyvêmederê kriyete hevqafiye, an boherdûpeyvî qelay û gulaley paş qafiyeyxoî dedwêy bi kar aniye, bopeyvê bibînm jîpeyvê deçim û bopeyvêpêkenîjîpeyvêgewcêtî kriyete hevqafiye û hud...Herwiha li hinek cih de bi ko/gelejmar dinvîse, lê ji boragrtina qafiyeya helbestan dike bi tak/êkjmar ya bi berevajîve, bonimûne li helbesta bûkeşûşeda dibêje:

Çawekanî reş reşe

Demîpri xendeygeşe

(Dîwanî Minalan,r.31)

Livir de madam behisêçavekan hatîye, lazime binvîse reşn, ne reşe, lê bovêçendê ku digel geşe bibête hevqafiye wihanivîsandiye.herwiha li helbesta tabiloyek jî de dibêje:

Dukelêkî reş ûçlkin

Bedewrîda wrûjawe

Behezaran minal ûjn

Le nawendî tabilokeda kujrawe

(Dîwanî Minalan,r.295)

Dîsa bohezaran zarok ûjn, kuprijimare ne êkjmar ji bervêçendî kujrawn tê bi kar anîn ne kujrawe, lê be sedema ewey ku digel wirujawe bibe êk qafiye bi kujrawe nivîsandiye.Li helbesta pele hewr jî de, çend komelek berxkî hene, lê nabêje bê leken kuprijimare, dibêje bê lekeye, de ku bibîte hevqafiyeyapeyva heye:



Çend komelek berxm heye

Sipî sipî bê lekeye

(Dîwanî Minalan,r.50)

Sebaret bi navunîşanjî, pêdvye ewe bêgotin ku Letîf Helmet li hlbjartina navunîşanan de, gelek bi zanayî navunîşanê her tekestekî danayne, digel ewejî beşek li navunîşanên wî li hevdû nêzîkin, bonimûne ew helbestek nivîsandiye bi navêbûkeşûşe, helbesteke dijî heye bi navê bûkeşûşekem, tenanet navunîşanî dúbarejî hene, dû helbest nivîsandiye bi navê darstan, dû helbestên dî heye bi navê mamosta, zêdetir li helbestekî heye bi nava baran û hud...Herwiha hinek li navunîşanên wîgelek drêjn, mîna: mar nabête hawrê kes, werizekançend mangn, nawunîşanî minalanî kurdistan, deng ûawazî kotir û mêjuy şerî dû bizin û hud...

Letîf Helmethinek kereste ûpeyvû mîtaforê nû aniye navedebê zarokên kurd, ku di berê de an tûne bûn, an hindik bûn, ew digelnivîsînê helbestan, çîrokîjî feramoş nekr, li hunerî helbest nivîsînî da, helbesta azadî ya zurî heye, herwiha li hunerêçîrokehelbest an de cihê wî diyare, herwihajimareka berçavgotubêjûoperêtanî nivîsandiye, mifa li bîrokey helbest ûçîrokîgelên dî wergrtîye û li berhemî zarokan de berhemê wanî kriye kurdî, li navberhemên wergerandîy wî degirîngyeka mezin bi tekestê zarokan daye ewên zarok boxwenivîsandine.

Herçende berhemên zarokanîy Letîf Helmet nehatîneparve kirin bokîjanjîy zarokan dşên, lê bi xwendina beşa zurî ya helbestên wî xûya dibe ku bozarokênjûr 10 salan hatîne nivîsîn, çîrokên wîjî her wsaye "Zurbeyaçîrokên Letîf Helmet boqonaxa berîçûne dibistanê li hevhatî nîne beşa zurî ji bozarokênjîy 8-12 salan dşên".<sup>118</sup>Digel ewejî beşek li helbestên wî bojîy kêmtir ji de salanjî li hevn û digel zarokî şeş salan û heft salan daxfn, li dîwana ciwantirîn dê de helbestên daykim û pak ûxawênî ûbaxçey fêrge bozarokê qonaxa destpêka ya xwendin û tenanet ya baxçey zaroyanjî li hevhatî ne. bonimûne li helbesta minalanî baxçe de dibêje:

Ême minalî baxçeyn

Dadekanman

Fêrman deken şîrî ciwan

Leber keyn...

(Dîwanî Minalan,r.276)

Bi heman awayî li komele berhemên dijî de, çend helbesteke dî heye ku bozarokên bçûk dşên, mîna helbesta minalanî baxçe û rojanî hefte û nan xwardin û bawik û dayk... helbesta sana û hêsanin, peyvser bi ferhengê zarokin û dûrin li bi kar anîna wêneyagran û aloz, lewravê encamê ku muzefer mstefa îsma'îl li likolênêxwe de li serçîrokî zarokanîy Letîf Helmet nivîsiye û bi bawerê wî beşî zurîçîrokên Helmet ji bojiyê 10 salan dibin.

Beşek li tekestên Letîf Helmet ku ji bozarokan hatîne nivîsîn, pexşanehelbestin, ku xûyaye"pexşane helbest nivîsînêke li riwaletêpexşane lê helgrî hêman û tuxmê helbestêye, mîna: kêş, hunerên kelamî, lehnên taybet, qafiyeya navxwe, hawahengî tîpan û wêne dîdarî û hud...".<sup>119</sup> Beşek lipexşane helbestên wîpeyvû mîtaforî alozpeyvê cot watajî têda hatiye bi kar anîn, ewejîgelek caran zarok nikare fêm bike. lipexşane helbesta daristan de dibêje:

Bonayelin tawê Leser

Sewzegya yi qjnerma boxom

Lesergazeraypişt rakşêm

Kajî mandwêtê dûrîyi rêm

Dabmalm le estom..

Legomî xewî şîrînda.. hêmin hêmin..

Tepu tozî koç ûbarm le xom bşom..

(Dîwanî Minalan,r.43)

Gelozarok livê wesf û runbêjî û mîtaforan fêm dike? xûyaye evwêne helbestîyane ji bozarokgranin, bi taybetî ji bozarokênjêrjîy deh salan, ew bi xweji behisîvêçendî dike ku nikare zêdetir li 10-12 salan xwe bçûktir bike, lewra tê dîtin ku beşek liçîrokên wîjî ji bozarokangranin" Çîrokên Letîf Helmet zêdetirînî ji bozarokên qonaxa 8-12 salan hatîne nivîsîn. herwek bi xwedibêje ez nikarm li 10-12 salan zêdetirxwe bçûk bikm".<sup>120</sup>

Ew li helbestan de mîna kesekê zimanparaw û kurdîzanekê zîrek û hişiyar hatiye derketin, ew kurdîzanîy wî hege dihelek cih de bûbe alîkar de ku helbestê nazk û bedewtir ji bozarokan binvîsî, lê li hinek cih de be sedemagraniya formê helbestan û mîna tekestekî aloz û bi mjû tuman tên derketin, bonimûne zarok çî qas lipeyvên rezin, yadge, dexezer, qeqnes, meloş, hejg, tîlmask, zgar, kakêşan, çnçlî, riçî, porxiz, naqre û beqete... fêm dike, an hege li navçekjî bîn bi kar hatin, li beşê zurî yê zarokî navçeyên dî yê kurdistanê, ku bi diyalêkt û beşe zaravayê dî daxfn, tu caranjê fêm nakin.

Letîf Helmet komelekpeyvû têrmêxweşikî li tekestên edebêyn xwe de bi kar aniye, ferhenga wî yê helbestan tjîpeyvên gul, nîşitiman, beheşit, perî, xende, baxçe, hêlîn, colanê, plîstanik û asman û hud... ne, lê li bi kar anînagelekpeyvû têrmjî ku rengegelekpewîst nebin li tekestî zarokan de bîn bi kar anîn, lê li cem wî hatîne bi kar hatin, bi taybetî li ezimûnê berahîy xwe de, peyvên mîna qenare, xun, pejare, tabût, çepel, dêze, negrîs, bedkar, drunde, genî, napakij, bê emek, tif, tifeng, tanik... tên dîtin, ewejî hege zirarî bi edebê zarokanî yê wîjî negehandibe, bêguman tu dem mifay nebûye, herçnde hinek ji wan derbrînan sîçl salan berî niha hatîne nivîsîn, lewra hege bikevin ber dadgahê rexinejî dibe reçavîvê serdemê bê kirin biçavîvê qonaxê bê nrxandin.

Ferhenga zimanêLetîf Helmet dewlemende û li bi kar anînapeyvû hevukan de xudan ezimûn û westatîy ye, zêderoîyî nîne hege bêjîn tu hevuk û mînak û wêney krçukal û bê wata nayê dîtin, hege heşbegelek kêmin, herwiha lipeyvû têgeha navferhenga zaravayê soranî de haydarî heye û heya astekî bilindjî li bi kar anîna rênvîsî de bi hûr nivîsandiye, digel ewejî li hinek cihan de li bi hevralikandinîpeyvûpaşgerek, an ji hevcudakirinapêşgerek ûpeyvêpiştê wî, hinek caran rastî şaşêî hatiye, bonimûne liçîroke helbesta ciwantirîn dê denivîsandiye :

Gundekem le hemû cîhan qeşengtirew kaniye

Biçkolekanîşîyi le hemû deryakanî cîhan mezintiru

Şox ûşengtire

(Dîwanî Minalan,r.21)

Hege ji bokañyejî êk î bi kar bîne û binvîse kaniye hita astekî normale, lê diyar nîneji berçî ji cihê biçkolekanîşî, nivîsandiye biçkolekanîşî! an li qeşengtir û mezintir drust

nivîsandiye, lê li cihêşox û şengtir, nivîsandiyeşox û şengtir. Herwiha bûkeşûşeî bi bûke şûşe û bûke şuşejî nivîsandiye, li cihê ciwanîyi dayk, ew ciwanî daykî nivîsandiye, li heman demda ba nabînêrê yê bi ba nabîyinêrê nivîsandiye, goranîpîtekan yi nenivîsandiye û goranîpîtekan yi nivîsandiye, peyvê leserxo î bi le ser xo nivîsandiye, herwiha ji bo bapîr nebîn ew bapîr nebînî nivîsandiye... me dzanîn bi êkeve nusandinîpeyvdişgêlêşgr ûpaşgerek, an nivîsînî êk (u) û dû (u), an bi kar anîna êk (î) û dû (î) li zimanê kurdî de bi taybetî li rênvîsa elfbay 'erebîda arîşeya zurî heye û heya niha nehatiye hesm kirin, lewma "çend carek kori û kobûnewe û semînarê taybet hatîne li darxistin ji boêkxistina rênusa zimanê kurdî û rêketin lser hinekpeyvû têrm ku arîşe têda hene, lê tu caran bi qasîpêwîst encam nebûye".<sup>121</sup> Lê evmînakên hatin behis kirin dikevin derveyêvêkêşe û arîşan.

Herwiha Letîf Helmet li bi kar anîna hinekpeyvvan de, mînapêwîst û hûr mameley nekriye, herçnde kêmjî bin, lê madam li berhemî ser bi edebê zarokane, zuwîtir tê hest kirin û kêmtir delîveya ewe cê bi cêdibe ku bêgotin li bin navêlîstikkrdin bipeyvvan û mîtafor û runbîjî û hud..., diyar nîne ji berçî ew (mer ûpez)î bi hevra bi kar aniye, li demekî de êk wata hene û mîna bejn û bala jî nîne. Peyvaprime bogriyan tê bi kar anîn, ku bi watayê şîwen, şîn, griyanê bi hêz, griyanê ji nşkîve tê, 122 lê ewprimeypêkenîn yi bi kar aniye. li cihekî dî de firmêskî qal û (kevukî mor yi bi kar aniye! ku tu watayê drust nîne.

#### **4.4. Emîn Mihemed**

##### **4.4.1. Jiyana Wî**

Heme Emîn Mihemedîsma'îl berinyas bi Emîn Mihemed li sala 1962 an de li bajêrê slêmanî li başûrê kurdistanê ji dayk bûye, heya amadeyî xwendiyê, ji bilîçapkirina dîwanekî helbestan bomezînan bi navê helwêst li sala 1991 an de, herwiha heya nihapênc berhem ji bozarokan biçapgehandiyê,<sup>123</sup> ku herpênc berhem helbestin, bi navên Malî Baran li sala 2010, Hawrêr Niwê li sala 2011, Xewinî Çoleke û henge wirdîlejî li sala 2011, goranî Hewrekan û Xeyalî Minalane li sala 2012, gelek li helbestên Emîn Mihemed ji aliyê stiranbêjên kurd hatînegotin.<sup>124</sup>

##### **4.4.2. Berhemên Wî**

Malî Baran: Dîwana Malî Baran bi tîraja hizar heb li slêmanî û li sala (2010) hatiyeçapkirin, sercemî helbestêvêdîwanê li sala 2009 de hatîne nivîsîn, Malî Baran li 22 tekestî helbestapêk tê, ku têda tenêêk helbest deh kîte û dû hebîjî biçarde kîte hatîne

nivîsîn, yn dîpênc helbest bi heşit kîte ûçarde helbestjî bi kêşê heft kîteyî hatîne nivîsîn. praniya helbestê emîn kurtin, li heft malîk û heşit malîk tînpêk hatin.

Hawrêy Niwê: Kitêba Hawrêr Niwê, li sala 2011an de hatiyeçapkirin û 10 tekestî helbestan têdaye, çar helbest li ser kêşê 7 kîte û şeş helbestjî li ser kêşê 14 kîteyî yanî 7+7 hatîne nivîsîn, helbestên navpirtûka Hawrêr Niwê li herdû sala 2008 û 2009 de hatîne nivîsîn.

Xewinî Çoleke: Evberhemjî li sala 2011 an de hatiyeçapkirin, li bîst û dû tekestî helbestîyipêk tê û hevde helbest li ser kêşê 7 kîteyî ûpênc helbestjî li ser kêşê 8 brigeşî, hemû helbestên navdîwana Xewinî Çoleke li sala 2010 y de hatîne nivîsîn.

Henge Wirdîle: Pirtûka henge wirdîle li 6 helbestên zarokanpêkhatîye û taybet ji bozarokên baxçey zaroyan hatiye nivîsîn, evpirtûk li sala 2011 hatiyeçapkirin. Livê 6 helbestê de, 3 ji wan li dîwana goranî hewrekanjî de hatiye belavkirin.

Goranî Hewrekan: Dîwanagoranî hewrekan li sala 2012 an de hatiyeçapkirin, evdîwan 22 tekestî helbestîyi têdaye, ku şazde helbest ji wan li ser kêşê 7 kîteyî ûçar helbestjî li ser kêşê 8 kîteyî û didû helbestjî li ser kêşê 10 kîte yanê 5+5 hatîne nivîsîn.

Xeyalî Minalane: Evdîwanejî li sala 2012 an de hatiyeçapkirin, 16 tekestî helbestîyi têdaye, ku yazde helbest li ser kêşê 7 kîteyî, didû helbestjî li ser kêşê 8 kîte, dû helbestê dinjî li ser kêşê 14 kîteyî yanî 7+7 hatiye nivîsîn, herwihaêk helbestjî li ser kêşê 16 kîte yanî 8+8 hatiye nivîsîn.

#### **4.4.3. Geşitek Bi Helbestên Emîn Mihemed De**

Emîn Mihemed li helbestên xwe de hemû dem li livîn ûgeryan û seferan de ye, helbestên wî hemû dem bal dgrin û dfrin, geran û bzavû livîn û sefer ne tenê ji bokulan û tax û bajêr û ser zemînekî evcîhane, lê belêgeran û seferêEmîn Mihemeddigel zarokan de boser kopkêçya ûpiştê ewr ûçûn ji bolayê meh û stêrane, roîşitin ji bonavruwîbar û derya, axaftine digel ewr û hlm û solavû şepol û nmeya baran û klûya berf ûgveyê ba, ew bi zarokan dibêje werin ba hevalê sûske û fil û meymûn û hrçû mêş hnguvûpêlîstanikan bîn. Gelek dem li ser wan daxfe û dxazn digel meh û rojde baxfn û bçn boser ewr û esmanê:

Were xoreke

Bibe be hawrêm

Dey dey xêrake

Wa minçawerê m

Heya le bendapaşîn de dibêje:

Ta asmanî beriz,

Piştî hewrekan

Berew xorinşîn

Eroîn êwaran

(Malî Baran, r.6)

Helbestên emîn dixazngeşit biken bonavqulayî derya û digel balindeyît avî bi navruwîbarda bçn:

Benaw riûbarda erom

Awî zeryakan exom

Wek balndey naw awm

Leser şepol westawm

(Malî Baran, r.13)

Ew digel avê kanî de radibe û dibe bi hlm û digel ba de diçe ji boser kepê bilindî ya şax û hey a toqî asmanê nasekine, piştiradigel ewrên asmanan devedigere bocem zarokan:

Min awî kanîm teqiyum

Lejêr zewî helquliyum

De seym ken êwey minal

Runim wekuçawî qrjal

(Malî Baran, r.14)

Livê cihê ku li ser zimanê mîzelan debidebe ûpelîstank û mêş hinguvjî ji bozarokan qise dike, her dem hez ji firîn û sefer û roîşitin dike:

Wutî bêzarm lêre

Deçm bolay estêre

(Malî Baran, r.18)

Herwiha Emîn Mihemed ku li fil, sûske, çvîk, kuçk, beq, hrç, mşk, pisîk, mirîşk, mêş hnguv, plîstanik, meymûn, masî û tîmsah daxfe, wêneya hunerî ya şîrîn nazk xuya dike :

Giwê m lê bû beyanî zû

Pepûle û hengdû be dû

Deyanprî legulê

Rêgay baxiyanpê bilê

(Malî Baran, r.24)

Emîn Mihemed di helbesta Malî Baran de, ku yekjdîwanê xweji bi navkriye, berewajê yasa û sirşitê meiluf, nabêjîte zarokan baçaverê bîn baran li asmanê bête xarê û seywan heldîn, nabêje ku baran barî, aw zur dibe û mifay heye boruwek û candaran... lê belê daxaz li zarokan dikedigel wî de bçn bomala baran, destê ba bgrin û bçn bocihekey bilind ku malî berf û baran û tezire li wir e:

Êweş werin minalan

Deçîn boMalî Baran

Befr û baran û terize

Maliyan le şwênî berize

Hewir Malî Barane

Dilgîre û berfrawane

Dey ba dest bgrîn be ba

Berew asman bmanba

Legel ewda degerêîn

Ba ruwî lekwê bû lewêîn

Ay xodilopey baran

Wa sergonamî tezan

(Malî Baran, r.16)

Tole û dujminatî û êk û du xarin û ewî dî ji navbrin, li ferhenga helbestên Emîn Mihemed de tûneye, ew dixaze her kes heval û dilsozê hevdû bin û stirana xweşewîstî bêjin, alîkarê yek û dû bin, li helbestajiyên le darstanda li ser zimanê mar de, bi smore û ruvî û ferxeya wan dibêje netirsîn û ez dbm hevalê we:

Marîş katê ewey bînî

Westa leberpêkenînî

Wtî botirsan bem şêwe?!

Hatûm bibme hawrêî êwe

(Goranî Hewrekan, r.4)

Li helbesta aşitibûnewe de, karoke digel ferxeyêgur û rovî de, her arîşek xelas kriye û bi hevra dijîn û behisê mafî cînartî û aşitî û tebahî û dilpakî dîkin:

Karjoley bzne kêwî

Lay bêçuwîgurgû rêwî

Westawn leber derga

Leberdem malîgurga

Delên ême sê hawrêîn



Lem darstane hawsêîn

Be aşitî û be tebayî

Kewtwîne bezim û şayî

(Xewinî Çoleke, r.3)

Li cîhana helbestên Emîn Mihemed de, candaran li demaprîs ûpêdvî bunê de alîkarîyê hevdû dikin, mîna li helbesta kerwêşke wîrdîlede, ferxeya kêruşkî wnda dibe, lewra diçe li smorepirisdike, ewjî dibêje li ba meye û digel ferxeya min bi hevra lîstikan dikin. Herwiha li helbesta jiyana le estêreyekî tirda dixaze kugur ûpez bibin hefal, mşq ûpisîkjî dîlanê bikin:

Gurgû merî debin be hawrê

Ew şwane û em delewerê!

Pişîle reşe û mşke bore!

Dîlanê deken be nore?!

(Xewinî Çoleke, r.18)

Herwiha ew li helbestên qaze sipî, bukelekanim, tabiloî aşitî, filêkî biçkolane, yarîpşîle û mişik), hawrêyetî û tînutî...de, li ser zîmanê zarok û bûkk û candaranve, dixaze ku qaz û kuç, çvîk û ruvî, hrçû kuçka sipî, fil ûçvîk, mşq ûpisîk... bibin bi hefal û hevdem û alîkarî hevdû û bi xweşewîstî û tebahî bi hevra bjîyên û lîstik bikin û rêz li mafê hevdû bgrin û rêsayê dîmukrasî cê bi cê bikin.

Hege lîgelek li helbesta hingî û nihaya zarokan de, mar û dûvpşk û qrk û ruvî... nîşane û hêmanê xirabî û şerî û w fêl û dûruwîyî bin, lêEmîn Mihemedgotara helbestêxwe de tekez li servêçendêdike ku dibe her tşît bi aşitî bêçareser kirin, hita li helbesta buke sûreda ku marek dixazeêrşan ji boferxeyaçîçkî bibet, lê helbestvan mar nakuje, lê belê tenê li ser darê tîne xarê:

Xom zanîm buke sûre

Le bêçuwekanî dûre

Ke bînîmpeşokawn  
 Le hêlane xizawn  
 Wtim ha, çî riwîdawe  
 Bocriyuwetan nemawe?  
 Wtiyan eha, ew mare  
 Hatuwete ser ew dare  
 Deyewêt hêrş bêne  
 Zerinequte bfrênê  
 Minîş xêra ser kewtm  
 Bolayan berêkewtm  
 Îtir yekser be darê  
 Marekem hêna xwarê

(Xewinî Çoleke, r.13)

Helbestvan dzane zarokan bigelemperî hege candarekî ji bowan neniyaş be anjî tirsjê heyn, bi behiskrdin û navanîn ûjê nêz bûn û hevaltî kirin, evtirs û namoîyi namîne, lewra behisî candaran û axaftin li ser zimanê candaran, ruwîbereka mezin li tekestên Emîn Mihemed de hene digel candarê malî de digel candarî kevîjî hevaltîpeyda kriye, mînaçewa behisî baldaran dike, candarê avîjî nehatîne feramoş kirin, lewra navû klam û biserhatêçivîk, fil, se, sûske, meymûn, plîstanik, mêş hnguv, mirîşk, hrç, mşk, pisîk, beq, xezal, smore, ruvî, mar, kevuk, berx, qaz, masî, tûtî, gur, bzn û karokeî nivîsandiye û hatîne nasandin bi zarokan.

Piraniya helbestên Emîn Mihemed hege boser her zimanekî cîhanê bèn wergerandin, heval û dostî zarokanin, hemû ew kereste ûpeyvû têrm û hevukên ku ji cem wî hatîne bi kar anîn, çewa ji bozarokekê kurdistanê cihêgirîngû mêze kirinêne, wihajî zarokê neteweyên dî dibe ku mifa ûgirîngî û bandor ji bowan hebe, lê beşek ji helbestên

helbestvanî, taybetin bi zarokên kurdistanê û tenê ji boxweşewîstî xelik û xak û ala û welatê kurdan nivîsandiye:

Çawimgêra beseryana

Bedway nawî kurdistana

Her le nexşeke ramabûm

Be diyariyewe hepesabûm

Demût nîşitmanm kwê ye!

Bonaybînm le hîçcê ye?!

(Xewinî Çoleke, r.19)

Ew wextek behisa kolare/pşqaqezjî ji bozarokan dike, tekez li servêçendêdikeji bervêçendêpişqaqezêxweş dvêçunku mîna rengê alayê kurdistanê ye li kesk û zer û sor û sipî tênpêk anîn, ew bi babenwêl dibêjegahêxwe bide minçma welatê minperçeperçeye:

Wirdgerawm Leser nexşe

Tom nebîniywe bmbexşe

Wilatî tonawîçîye?

Ey bonawnîşanî nîye?

Babe nwêlgwê bgre lêm

Tapêt bilêm kê m û lekwêm

Kurdim xelikî kurdistanm

Dabeşî ser wlatanm

(Goranî Hewrekan, r.6)

Emîn Mihemed li helbestên xwe de, bi zarokan nabêje wa biken û wa bron û evkare neken ûpêdvye wabe û hud... mîna li naverokê gelek livê helbestên hingî û niha ji bozarokan hatîne nivîsîn bivê ziman û rêzikêdigel zarok daxfn, hita li ew helbestên ku

dikevin navçarçêveya helbestêperwerdeyî û fêrkarî, bi zimaneka narastewrastî têkil bi endêşe û xiyal û lîstikî zarokaneydibe. Ew bi zarokan dibêje heya rojawa nebe stêr derinakeve, qse ji bowan dike û mifayê kompyuter û înterinê xûya dike, behisa surêjyanî beq, helhênaniçêçk, çekirina hêlîn ji aliyêçvîk, sirşitêjyanî tûtî, rengû şklê şemame û hud...:

Min awî kanîm teqîwim

Lejêr zey helqulawim

De seyrî ken êwey minal

Runim wekuçawî qirjal

Hawrêy kêlge û baxî şarim

Min bêçwî derya û rubarim

Ke tîşkî rojgermm deka

Debim be helm û ba demba

Deçme naw hewrêkî sipî

Milî rê degrîn be kpî

Wird wrd deroîn be asmana

Beser lutkey beriz û ciwana

Demê hewr degrmêne

Be lêzime damdebarêne

Debim be lafaw lew kêwe

Degerêmewe lay êwe

(Malî Baran, r.14)

Herwiha Emîn Mihemed li helbestêxwe de ji bozarokan behisa spor, roja cîhanî ya zarokan û roja cejn û yadî li dayk bûn û serî sala nû kriye, herwiha xweşewîstîyi dayk û bajêrê sine û xweşikî yapirtûkxane û cîhana miyuzîk qal kriye.

Xwendin ûçûne dibistan û rêzgrtin li mamoste û xweşwîstina hodeya dersan û kelupelê xwendekar ji cem Emîn Mihemed cihê taybetî ya xwe hene, li beşekî helbesta amadekarî de dibêje:

Amadem xomgoriywe

Polî yekm briywe

Cantakem heldegrm zû

Ca deçm bopolî dû

Defterî wênempêye

Legel desteyek boye

(Goranî Hewrekan, r.20)

#### 4.4.4. Ziman û Formê Helbestên Emîn Mihemed

Bi mêze kirin li formê helbestên Emîn Mihemed xûya dibe ku hemû helbestê wî li ser kêşî xomalîne û zêdetirjî li ser kêşî heft kîteyî hatîne nivîsîn, tu helbestekî azadjî nenivîsandiye. derbarê qafiyeyî Emîn Mihemed zêdetir cot qafiyey bi kar aniye. Herçende berî ewey helbest ji bozarokan binvîsî, helbesta azadî ji bomezinan nivîsandiye, hsên befrîn dibêje: "Lê ew ji bovêçendê de ku bi cîhana zarokan aşna bit zorizaniyek bi kar anî hêdî hêdî li helbestê azad dwîr ket: demê baran ebarê, seywanekem xweşewîste, Leser serm ray egrm, çunike ewmpêwîste. Liçend helbestan de Emîn drêjey bi heman şêwazî kêş û rêzband didet heyapiştira li ser cot kêş û cot rêzband sekinî".<sup>125</sup> Herwiha ew tu helbestê drêjjî ji bozarokan nenivîsandiye.

Zimanê helbestvanî kurdîyeka zelal û nazke, hevukê kurt û bi wata bi kar aniye, kîjanpeyv nazk û şîrîne di helbestî xwe de bi kar tîne, her malîkekek bi xwe wêneyeka rengawrengî ya hunerî ye, Emîn Mihemed le cihekî hege bi nerênî behisa candarekjî bikegelek bi nermî û hedarîglî ûgaznjêdike:

Tutkegwê qutey crpn

Boçî dewerît bi min

(Malî Baran, r.10)

Herwiha dema behisa meymunêdikedibêje:

Werin seyrî ew meymune

Çende lasar ûçetûne

Her xerîkî raw rawêne

Zor hezî le bazbazêne

(Malî Baran, r.19)

Dîsa henekan digel hirçeborêdike biçavçnok û têrinexor navê wî tîne, lêpiştira her bi xwedibêje ku xudanî dîmenekîdilgîre:

Hey hey wa hat wrçe bor

Çawçnokî têr nexor

Laney hengeşêwênê

Hengwînî eçorênê

Hita li bendapaşîn de dibêje:

Seyrî ew wrçepîre

Dîmenîçend dilgîre....

(Malî Baran, r.26)

Herwiha li helbesta yarî mşk ûpşîlejî bi nazkîgazande lipisîkêdike û bipşey kerî navî wî tîne, lê li malîkên dumahî de, bipişeçawşîngasî wî dike. Herwiha kugelek ligur narhet dibe lê dîsa mîna ewey henekan digel candareka xun şîrînbike bigurgêçlek û xwarinhez navê wî tîne:

Gurgîçepel û newsin

Waz bêne le hawrê min

Heste kerwêşke rake

Êsta helêkîçakî

(Xeyalî Minalane, r.5)

Herwiha digelek helbestan de Emîn Mihemed bivanpeyvan henekan digelcandarandikeçaw bizîgiwê qutîle, kerwêşke xepan, çenebaz, bizêw û wirdîle û hud...

Bi awaiyekîgelemperî zimanê helbestêEmîn Mihemedîpeyvê biyanî têda nîne ûgelek caranjîpeyvên xewin û xiyal û hevaliyetî ûgeşit û xweşewîstî... li tekestên xwe de berdewam bi kar tîne, herwiha ligurek malîkanjîpeyvû hevukê mîna xilexil, grugal, baskewbask, ba'eba', qaqa, bex bex, cîk cîk, wird wird, hey hey, haha.. bi kar tîne û li ser zimanêcandaran diaxfe:

Ha, ha Leser sehola

Le darstanîçola

Şanî boeleqênê

Eriwa û xwe exlîskênê

(Malî Baran, r. 26)

Livê helbestê de mêze bikîn tê dîtiņewa sureta solavan bipeyvan dkşîne:

Ewetam le baxêka

Le damênî şaxêka

Cogeyek awî sazgar

Weku tavge dête xwar

Kefî sipî wek ziywe

Wirdçawm têbriywe

Xure û haje û criywe  
 Dengiyan lê helbriywe  
 Gelay teri ûprjey aw  
 Sersamiyan krdûm tewaw

(Xewinî Çoleke, r.8)

Herçend heya astekî zor rîtm û awazê helbestên Emîn Mihemedî xweş û hêsan û zarokanîne, lêhinek caran bi sedema reçavnekirina kêşê nîvmalikan, hinek natemamiçêdibe, li helbesta boqîle de, ku bi kêşê heft kîteyî hatîne nivîsîn, lê li nîve malîkê sêyem de dibe heşit kîte:

Herçend be beçke masî  
 Sereta mintan nasî  
 Belam sermêkutem nawe  
 Malim lenaw zelkawe

(Malî Baran, r.30)

Herwiha li helbesta hawrêyetîjî de, ku helbesteke li ser kêşî heft kîteyî hatiye nivîsîn, lê nîvmalîkê şeşem bi tenê li heşit kîtepêk tê:

Kerwêşkekem hênawe  
 Lay pşîle daminawe  
 Delêm miywane lay to  
 Agadarî be meyxo  
 Botodezanît minçîm  
 Xominpşîley rastî nîm

(Goranî Hewrekan, r.18)



Wek tê dîtin tenê li nîvmalîkêdibêje xominpişîley rastî nîm li heşit kîtepêkdêt. Ew qasîpeywendîdare bi rênvîsîjî hebe, Emîn Mihemed xebitiye ku ser li zarok tevî hevneka û zêdetirpeyrewêvê rênvîsêbike ku li ba xundewarê kurd li başûrê kurdistanê têbi kar hatin, lê hêjpêdvî bû ew zêdetir bi hûrî digelmijarê rênvîsî de nivîsandba, lijêr de beşek lew şaşî û natemamî ku li biwarî rênvîsî de hene dxîn berçav.

Li helbesta Xewinî Çoleke de, ji boherdûpeyvê criywe û bîniywe dû (u)y bi kar aniye:

Destî krd be criyuwe

Witî xewnm bîniyuwe

(Xewinî Çoleke, r.9)

Li helbesta bêçiwepişîle de, ji bopeyvê (un) dû (u)î nivîsandiye, mîna dibêje:

Boxot lê win kirduwe

Lêre becêt hêşituwe?

(Xewinî Çoleke, r.7)

Her livê helbestê depeyva bêçû bi bêçû nivîsandiye, herwiha li helbestaperesêlke de ji bopeyva sûr êk (u)y nivîsandiye, lê bo dûr dû (u)î bi kar aniye:

Xincîlaneygerdin sur

Car carêk defrê bodûr

(Xewinî Çoleke, r.7)

Di heman demê de li helbesta buke sûre de, bûkî bi buk nivîsandiye, lê ji bosûr bi temamî dû (u) bi kar aniye, her livê helbestê de dîsa criywey bi ciryuwe nivîsandiye! herwiha ji bodenûk, sûk êk (u)î bi kar aniye û bi denuk, suky nivîsandiye, lê li cihê dî de, denûky bi kar aniye, herwiha îca biçûky bi biçuk nivîsandiye. li dû malîkî hevdu hatî de ji bopeyvaçetûn dû (u) bi kar aniye, lê ji bo meymûn êk (u)î nivîsandiye! herwiha bo biyutaye, ziywîn dû (u)î bi kar aniye û nivîsandiye biyûtaye, ziyuwîn!

Herwihapeyvên ciwan bû û asan bû bi ciwanbû û asanbû nivîsandiye, krđin bû û brđin bû jî kriye krđinbû û brđinbû, di heman demê depeyvên kwêye û cêye û nwêye ûpêye brsîye û nîye û asayye û lasayîe û lêye û lewêye ûçawerêye, bi kiwê ye û cê ye û nwê ye ûpê ye û brsî ye û nî ye û asayî ye û lasayî ye û lê ye û lewê ye ûçawerê ye nivîsandiye! herwiha aşitîxwaz ya bi aşitî xwaz nivîsandiye ûpelkezêrînejî kriye(pelke zêrîne, lê ji bohevokên rengawreng û gurcugol bm , ew bi rengaw rengûgurc û golbm î nivîsandiye!

Xozî ji bo aske bçkole ba'eba'î bekar ne danî, lewma ba'eba' bopez tê bi kar anîn, ne ji boask/xezalan.herwiha bi hrçjî dibêje ebolênê.Peyvê navhelbestên Emîn Mihemed bigelemperî ser bi ferhenga zarokanin, bi astekagelek kê m nebepeyvû hevokêgran û namonayê dîtin ku fêm kirinî ji bozarokan bi zehmet be, ligelvéçendêjî carina hndekpeyvên mîna çexmaxe, xerek...y nivîsandiye, ku zarok an zarokên ku hita bi soranîjî daxfn bi drustêjê fêm nakin.

Li hinek cihê de ji borîkxistina qafiyeyê helbestan, helbestvan xwe naçar kriye hinekpeyvbi kar bîne, ku carina be nerênê bandor li ser wata û layenêt îstatîkêê helbestan kirine, bonimûne li helbesta friyaguzar de dibêje:

Minîş carêk le caran

Bûm be friyaguzaran

Beswarîpiştî keşitî

Deryageram begiştî

(Xeyalî Minalane, r.21)

Livirde xûyaye ku ji boamadekirinapeyvekê ku qafiyeyê wî mînapeyvêcaran be, ewpeyva friyaguzaranî bi kar aniye, li demekî de kurdê soranî dibêje bûm be friyaguzar û tu caran nabêje bûm bi friyaguzaran .Li helbesta mirîşke sipîjî de, ku dête ser behisî êkek li cuçkan, lazime bêje şirîne, lê heta qafiyeya wî mîna qafiyeyapeyvê bîbînin be, ewpeyvêşirînin bi kar aniye.

Yekêkiyanperi lipê ye

Zor ciwane hezim lê ye

Bediyariyewe westawm

Win nabê leberçawm

Êweş werin bîbînin

